Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1354 25-Sibat-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Bi firotina rûnê Erebî debara jiyana xwe dike





**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Dayika bi navê Hemda Cedian dayikeke ku her roj berê xwe dide bazara bajarê Qamişlo da ku rûnê Erebî bifiroşe û debara jiyana xwe pê bikin.**

Ji ber rewşa zehmet ya jiyanê dayika bi navê Hemda Cedian diçe bazara bajarê Qamişlo û rûnê Erebî difiroşe. Ji dema ku hevjînê wê jiyana xwe ji dest daye wê berê xwe daye kar da ku debara jiyana xwe bikin. Dayika bi navê Hemda Cedian tevî pênc zarokên wê jî lê ew tenê di mal de kar dike û her roj berê xwe dide bazara bajêr.

**Çîroka dayika bi navê Hemda Cedian**

Dayika bi navê Hemda Cedian ew ji gundê girê Ebid Elezîz e. Ew jineke ku temenê wê zêdeyî 50 î salî ye. Jineke ku her tim diçe bazarê rudine da ku rûnê Erebî bifiroşe û debera jiyana xwe bikin. Ew di malbatê de ji 7 kesan pêk dihatin. Lê hevjînê wê jiyana xwe ji dest da, niha tenê 6 kes di malbatê de mane. Her 5 zarokên wê kar nakin tenê ew bi wî temenê xwe yê mezin diçe bazarê û kar dike. Rûnê Erebî yê ku difiroşe jî ne rûnê wê ye. Rûnê dayikeke ku ji gundê wan e, ji ber rewşa wan ya madî gelekî lawaze rûn têne bazara mezin ya li bajarê Qamişlo da ku jê re bifiroşe û heqdestê xwe bigire dest. Dayikeke ku nêviyê roja xwe li bazarê dibe, da ku milet rûn jê bikire û vegere malê ba zarokên xwe.

Rûnê Erebî yê bi bihaya 50 hezarî heya 70 ê hezarî ji wê dayikê re difiroşe û 50 hezarî heqdestê xwe dibe. Ji ber Heqdestê wê 50 hezare gelekî zehmetiyan dibîne ji ber ku têrî wan nake. Tiştekî wan tune ye ew dixwaze kar bike da ku debara jiyana xwe bikin. Ji dema ku hevjînê wê jiyana xwe ji dest daye ew tê bazarê û kar dike.

**Zehmetiya jiyana dayikê**

Ew di jiyaneke pir zehmet de derbas dibin. Her tim ji gund berê xwe dide bazara bajêr da ku wî rûnê Erebî bifiroşe. Ew Heqdestê ku distêne jî nîvê wê li çûn û hatina xwe dide heya ku dighêje bazarê. Dema ku ji bazarê jî vedigere malê tenê 30 hezar pêre dimîne. Ji ber çûn û hatina sûkê jî ne zêde ew demeke direj heya seat 3 yan jî 4 an dimîne. Gelek caran li bazarê dimîne û milet jê rûn nakirin. Paşê bi wê êşa xwe ya ku li bazarê mabû bi dilekî xemgîn vedigere malê. Ew weke her dayikekê dixwaze li gel zarokên xwe li mal bimîne lê ji ber rewşa wan ya xizan ew neçar e û kar dike.  Bihaya ku di rojê de 30 hezarî distîne têre kelûpelên wan yên xwarinê nakin.

**Bi kamîreya ronahî**



Hekemiyê

# Kevneşopiyek ku vediguhere barekî

**Ayşa Silêman**

Bi salan, li herêma Cezîrê, şîn bûyerek ji bo hevgirtinê bû, ku mirov li kêleka xemgînan radiwestiyan, sersaxî pêşkêş dikirin û êşa wan sivik dikirin. Sadehiya van rojan taybetmendiya wê bû, serdanek û peyvek xweş ji her tevgereke din girîngtir bû. Lêbelê, di salên dawî de, dîmen guheriye. Aheng mezintir bûne û hejmara sewalên ku tên serjêkirin zêde bûye, heta wê astê ku hin kombûnên şînê niha wekî bûyerên nîşandana dewlemendiyê têne hesibandin, ne wekî cihên xemgîniyê û piştgiriyê ji bo miriyan. Bi vê guhertina nexweş re, barê herî mezin niha dikeve ser milên feqîran. Gelek malbatên hejar niha dema ku kesekî ji malbata xwe winda dikin xwe bêçare hîs dikin. Dema ku xelkê herêmê bi adetên mîrasî yên amadekirina xwarinên gelek ve girêdayî ne, feqîr nikarin xwe bigihînin hev. Li şûna ku balê bikişînin li ser hevgirtinê û ji nû ve yekkirina xizmên xwe, ew xwe di bin zextek mezin a civakî de dibînin: Gelo “Ew çawa dikarin tiştê ku yên din pêşkêş dikin pêşkêş bikin?” Mixabin, di hin rewşan de, mirov ji tirsa gotegotan û rexneyên civakî, ji bo lidarxistina merasîmek cenazeyê, ne kêmtir ji yên din serî li deynkirina pereyan didin. Xuyabûn bûye esas, ji ber ku gelek kes hene pesnê xwe didin ku merasîma cenazeya herî mezin û herî zêde wî çêkiribû. Lê armanca rastîn a merasîma sersaxî ye, ne nîşandana xwe ye. Ev tevger bi awayekî nehevseng zirarê dide xizanan, ji ber heya ku ew xwe kêmtir nîşan nedin, ji derfetên xwe zêdetir bar digirin. Îro, a girîng ew e ku ev adet ji nû ve werin nirxandin. Peyama mirovî ya merasîma cenazeyê ne hewceyî pesindan û qurbaniyan ne. Bese ku mirov bi gotinên dilsoz, piştgirî û hestên rastî li kêleka malbata xemgîn bisekinin. Mirin ne fersendek e ji bo pêşandanê, lê belê bîranîneke nirxên dilnizmî û dilovaniyê ye, ku em hemû mehkûmî wê ne ku rojekê ji vê dinyayê derkevin. Vejînkirina vî ruhî di cenazeyê de li herêma Cizîrê hêsane,  dema ev yek hat sererast kirin wê ji bo herkesî bibe destkeftiyek civakî û exlaqî, nemaze ji bo xizanan, yên ku ji bo adetek ku wateya xwe winda kiriye bihayê herî bilind didin.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER PÎRÎ Û EXTIYARIYÊ**

**Agir agirê qoçan e:**
- Ji bo extiyarê jîr tê gotin.

**Agir agirê qurman e:**
- Bi heman wateyê.

**Berkendal bûye:**
- Êdî hêz pê re nemaye; êdî bi kêrî kar nayê; li ber mirinê ye.

**Celebê me beranê wî pîr e, lê mih tiştîr e:**
- Mezinê me kal e, lê hemsera wî ciwan e.

**Çirika wî çûye virika wî derketiye:**
- Pir extiyar bûye.

**Çirika wî çûye virika wî maye:**
- Bi heman wateyê.

**Dema hirç pîr dibe kudik pê dikenin:**
- Dema mirov kal û pîr dibin êdî qîmetê wan namîne.

**Dema hirç pîr dibe kudik bi gunikan dilîzin:**
- Bi heman wateyê.

**Dema gur pîr dibe, dibe qeşmerê kûçikan:**
- Bi heman wateyê.

**Destê wî ji erd û ezman qetiyaye:**
- Êdî bi kêrî kar û barê dinyayê nayê; pir extiyar bûye.

**Di qarçika xwe de şîn hatiye:**
- Ev kal karê xortan dike; vegeriyaye xortaniya xwe.

**Dûrê min nêzîk dike:**
- Ez pîr bûme, min ji dûr ve dibînin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Yekbûna jinên Kurdistanê parastina destkeftiyan û xurtkirina yekrêziyê ye



Siyasetmedarên Jin li Rojavayê Kurdistanê dan zanîn ku xurtkirina hevrêziyê di navbera tevger û rêxistinên jin ên li Rojava, Başûr, Bakur û Rojhilat de û yekkirina gotûbêjên wan di forumên navneteweyî de, beşek girîng ê têkoşîna parastina destkeftiyên gelê Kurd û xurtkirina yekrêziyê ye.**R-2**

## ‘Washington hewl dide piştgiriyê bide aramî û ewlehiyê’




Nûnera MSD'ê li Washingtonê Sînem Mihemed da zanîn ku ew li ser avakirina îstîqrarê, kêmkirina rageşiyê û piştgiriya çareseriyeke siyasî li gorî çarçoveyên navneteweyî yên peywendîdar dixebitin.**R-6**



## Kobanê di nava dorpêçê de êşa kêmbûna xwarin û dermanan dikşîne

Bêtirî mehekê li ser dorpêçkirina Kobanê derbas bû, bi dirêjahiya vê demê re bangên herêmî û navneteweyî ji bo vekirina rêyan û destûrdayîna gihandina lezgîn a alîkariyên mirovî zêde dibin.**R-3**



## Peymana 29’ê Çileyê; Di nava pêkanîn û gotûbêjê de


Xebatên ji bo pêkanîna peymana di navbera QSD û hikumeta demkî ya Sûriyê de didomin. Di vê çarçoveyê de têkildarî mijarên îdarî, leşkerî û ewlehiyê civîn û hevdîtin çêdibin, hêzên ewlekariyê li xalên hatine destnîşankirin, bicih bûne. Parêzgehê Hesekê dest bi kara kiriye, lê hê jî hin bendên peymanê pêk nehatine û gotûbêj li ser wan dewam dikin.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1354 25-Sibat-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BANGA AŞTÎ Û CIVAKA DEMOKRATÎK BI GAVAVÊTINÊN YEKALÎ PÊKAN NABE

Banga Devlet Bahçelî ku beriya salekê ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd li Bakurê Kurdistanê hat kirin, bi banga 27'ê Sibatê ji aliyê Rêber Apo ve hat pêşwazîkirin. Di nava salekê de li ser bingeha pêkanîna Aştî û Civaka Demokartîk gelek guhertin pêk hatin, ji gavên girîng avakirina komîsyonê bû ku bi vê yekê re êdî derbasbûna pirsgirêka Kurd ji qonaxa leşkerî ber bi qonaxa siyasî û hiquqî ve bû. Di vê çarçoveyê de gavavêtinên Rêber Apo û Tevgera Azadiyê hatin pêşxistin, lê ji aliyê dewletê ve tu gavên misogerkirina çareseriyê nehatin avêtin.**R-4**











## Vegera li Efrînê her zindî ye di dilê gel de

Di 20'ê Çileya 2018'an ewrekê reş û tarî bi ser xweza, jîngeh û jîndarên Efrînê de hat. Di dema ku şer ji 7 salan ve li Sûriyê bi hêrs û dijwar diqewimî û dirêj dikir, tenê Efrîn aram û azad mabû. Lê diyar bû ku cîhan ji bo vê yekê ne rihet bû, aramiya Efrînê ew dêşandin ji ber vê yekê hemû dewletan destê xwe kirin destê dewleta Tirk a dagirker de û fermana êrişa Efrîna aram dan.**R-7**

Rojek şûna salekê digre — Nehîr pale R-2
Rapora Komîsyonê — Farûk Sakik R-4
Guhertinên mezin çêdibin! — Dilyar Cizîrî R-6
Civaka welatparêz civaka herî azad e — Ehmed Hesen R-7
Çima naskirina zimanê Kurdî di destûra Sûriyê de girîng e? — Kemal Necim R-9
Perwerdehiya bi zimanê xwe prensîba hemwelatîbûna wekhev û aştiya civakî ye — Gulîstan Xalid R-10

# Yekbûna jinên Kurdistanê parastina destkeftiyan û xurtkirina yekrêziyê ye

Siyasetmedarên Jin li Rojavayê Kurdistanê dan zanîn ku xurtkirina hevrêziyê di navbera tevger û rêxistinên jin ên li Rojava, Başûr, Bakur û Rojhilat de û yekkirina gotûbêjên wan di forumên navneteweyî de, beşek girîng ê têkoşîna parastina destkeftiyên gelê Kurd û xurtkirina yekrêziyê ye.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Rojavayê Kurdistanê di demên dawiyê de rastî komplo û pilanên dijminên gelê Kurd hat. Ev yek ji taxên Kurdan yên Helebê dest pê kir û ber bi tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat. Bi banga seferberiyê re ji çar aliyên cîhanê gelê Kurd rabûn ser piyan û piştgiriya xaka Rojava kirin. ev yek ne tenê gel rakir ser piyan di heman demê de bû nîşaneya derketina helwesta hemû partiyên Kurd ji Bakur û Başûrê Kurdistanê bigre heyanî hundirê Rojava. Bêguman ev yekgirtin çawa ku ji bo gelê Kurd hewcedariyeke bingehîn e,ji bo dijmin jî metirsiyeke. Ji lewra derketin û yekbûna neteweyî yê gelê Kurd bi hemû partî û aliyan di vê pêvajoyê de, him gel ji hev du nêz kir her wiha li ser raya giştî bandor kir.

Têkildarî girîngiya yekbûn û yekgirtina netewî ya gelê Kurd, siyasetmedarên jin yên Rojavayê Kurdistanê ku endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Sûreya Hebeş û ji Meclisa Sûriya Demokratîk Derya Remadan ji Rojnameya me re axivîn.

**'Destkeftiyên gelê me careke din kirin qurbaniya lihevkirinên xwe'**

Sûreya di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser êriş û hedefgirtina destkeftiyên Rojava û wiha pê de çû: " Êrîşên dawî yên li dijî herêmên Rojava ku bi hedefgirtina taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest pê kir û gihîşt deverên rojhilatê Firatê û Kobanê ya ku di bin dorpêçeke dijwar de ye ku bandorê li pêdiviyên bingehîn ên jiyanê dike. Ev yek bi awayekî zelal nîşan dide ku destkeftiyên siyasî, îdarî û çandî yên gelê me hîn jî di xeteriya têkbirinê de ne. Tevî qurbaniyên mezin ên ku Kobanê di rûbirûbûna DAIŞ'ê de ji bo parastina hemû mirovahiyê daye, bêdengiya navneteweyî ya li ser hedefgirtina destkeftiyên gelê me û êşên wan îro pirsên kûr di derbarê pîvanên edaletê û pabendbûna exlaqî ya navneteweyî de derdixe holê.

Ew tiştê ku qewimî encama civîna Parîsê ya di navbera hikumeta Şamê û Îsraîlê de bû ku bi navbeynkariya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, di bin zexta Tirkiyeyê de û bi beşdariya çalak a Hakan Fîdan pêk hat. Armanc ew bû ku dîrok xwe dubare bike û destkeftiyên gelê me careke din bibin qurbanê lihevkirinên navneteweyî."

**'Yekbûn û piştgiriya gelê Kurd, vegerandina hevsengiyê avakir'**

Sûreya bal kişand ser yekbûn û piştgiriya gelê Kurd ya ku derketiye û wiha got: "Li hemberî van zehmetiyan, yekîtiya gelê Kurd li beşên cuda yên Kurdistanê û li dîasporayê wekî faktorek girîng ji bo vegerandina hevsengiyê derket holê.

Me li Başûr, Bakur û Rojhilatê Kurdistanê tevgereke girseyî ya bêhempa ya bi milyonan kesan, tevgereke çalak a civakên Kurd li Ewropa û cîhanê, her wiha hevgirtina hêz û partiyên siyasî yên Kurd, seferberkirina medyaya Kurdî ji bo ragihandina rastiya bûyerên diqewimin û xurtkirina piştgiriya mirovî ji bo koçberan, dît. Helbet ev yek bi giştî ji bo gelê Kurd li Rojavayê Kuridstanê cihê şanazî û piştgiriyê bû, hêviya hemû gelê Kurd jî ew e ku yekîtiya gelê Kurd bê avakirin."

Derya da zanîn ku ev helwesta ku hatiye derketin li ser raya giştî û navneteweyî zext da avakirin û wiha bilêv kir: "Ev yekîtiya siyasî û gel bû sedem ku zextek berbiçav li ser civaka navneteweyî bê avakirin. Ev yek bû sedema rawestandina êrîşan, kêmkirina rageşiyê çêkir û pencereyek ji bo danûstandinan bi Şamê re vekir da ku peymana 18-29'ê Çile bi dest bixe. Her wiha derxistina Fermana 13'an ji aliyê Ehmed el Şeri ve, di derbarê mafên çandî û ziman yên gelê Kurd de. Di heman demê de Ev yek vegerandina hemwelatîbûnê ji bo kesên ku hatine bêpar kirin û ragihandina Cejna Newrozî weke cejneke navneteyî ya gelê Kurd. Ev nîşane, tevî girîngiya xwe, gavên pêşîn in ku pêdivî bi yekkirina destûrî û garantiyên siyasî yên zelal hene."



Sûreya Hebeş



Derya Ramadan

**Esasgirtina Konferansa 26'ê Nîsanê**

Derya wiha dirêjî da axaftina xwe: "Qonaxa heyî pêwîstiya guhertina ji bertekê ber bi çalakiya rêxistinkirî ve dike. Ji ber vê yekê, avakirina dezgeheke siyasî ya yekgirtî ya Kurd li Rojava, li ser bingeha encamên konferansa Kurdî ya ku di 26'ê Nîsana 2025'an de hat lidarxistin, gaveke stratejîk temsîl dike ber bi xurtkirina hevkariya navxweyî û xurtkirina pozîsyona danûstandinê bi Şamê re.

Avakirina dezgeheke siyasî ya berfireh ku partiyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl û kesayetên neteweyî yên serbixwe di nav xwe de bigire, ji bo yekkirina xîtaba siyasî û çêkirina nêrandineke zelal ji bo pêşeroja Sûrîyê li ser bingeha nenavendîkirina sîyasî û misogerkirina mafên destûrî yên gelê Kurd, vedike

Ji aliyekî din ve, lidarxistina konferanseke neteweyî ya berfireh a Kurd ku nûnerên ji beşên cuda yên Kurdistanê tê de bin, dê helwestan hevrêz bike, dîplomasiya Kurd bike yek û rê li ber dubarebûna ezmûnên parçebûnê bigire ku di qonaxên dîrokî yên berê de pozîsyona Kurd qels kirin."

**'Jinên Kurd îsbatkirin ku ew stûnên bingehîn ên parastina ezmûna demokratîk in'**

Derya bal ki]and ser rola jina Kurd di parstina destkeftiyan de û yekgirtina jinên Kurdistanê û wiha got: "Ne mimkûn e ku mirov behsa parastina destkeftiyên gelê xwe bike bêyî ku rola bingehîn a jinên Kurd tekez bike, yên ku bûn pêşeng di aliyê siyasî û civakî ya Rojava de. Bi beşdarbûna xwe di saziyên îdarî, meclisên herêmî, rêxistinên civaka sivîl û di sektora parastinê de, jinan ne tenê xwe wek hevkar, lê di heman demê de îsbatkirin ku ew stûnên bingehîn ên parastina ezmûna demokratîk in.

Yekîtiya jinên Kurd û rêxistinbûna wan a di navbera partî û herêman de, garantîyeke rastîn ji bo parastina mafên jinan pêk tîne ku di van salên dawî de hatine bidestxistin. Bi taybetî jî prensîba hevserokatiyê, beşdariya wekhev di saziyan de, û derxistina qanûnên ku tundûtûjî û cudakariyê tune dikin."

**Yekbûna jinên Kuridstanê**

Derya di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya yekbûna jinên Kurdistanê û wiha got: "Her lawazbûnek di yekîtiya jinên Kurd de were derketin, dê van destkeftiyan bixe xeterê. Bi taybet em di hawîrdoreke herêmî de ne ku hîn jî bi îdeolojiyên dûrxistin û li dijî mafên jinan tijî ne. Ji ber vê yekê, xurtkirina hevrêziyê di navbera tevger û rêxistinên femînîst ên li Rojava, Başûr, Bakur û Rojhilat de û yekkirina gotûbêjên wan di forumên navneteweyî de, beşek girîng ê têkoşîna parastina destkeftiyên gelê Kurd û xurtkirina yekrêziya Kurdî ye."

Derya bi van gotinan axaftina xwe bidawî kir: "Tenê bi saya vê yekîtiya berfireh gelê me dikare destkeftiyên xwe yên li Rojava biparêze, ezmûna xwe ya li Başûr biparêze, têkoşîna xwe ya rewa li Bakur û Rojhilat xurt bike. Geşedan û guhertinên heyî yên li herêmê diqewimin, asta herî bilind a hişyarî û berpirsiyariyê dixwazin. Yekîtîya Kurdan, û bi taybetî jî yekîtîya jinên Kurd, garantîya rastîn a parastina rûmeta neteweyî, avakirina edaletê û avakirina pêşerojek hêjayî qurbanîdana gelê me ye."



## Ji Pênûsa Jin

### Rojek şûna salekê digre

**Nehîr Pale**

Sîstem û civaka zayendperest

Dîrokê de êşeke dirêj bi jinên Ereb da kişandin, ew kêlî, saet, roj û meh hîs nakin. Ruhî her tim hîs dikin rojek şûna salekê digirê. Daxwaza wan ji sîstem û civakê tenê çend kêliyan kêfxweş bijîn. Li gorî rewşa jinên Ereb ew kêlî jiyan kirin, mucîze ye. Mêr, adetên civaka zayendperest û olê Islamê destûr nadin jin kêf xweş bibe.

Jinên Ereb li hemberî zexta li ser wan tê kirin, fêrî têkoşînê nebûne. Buhayê binpêkirina adetên civakê û ol gelekî giran e. Jina li gorî adetan tevnegerê kêliyan tê ceza kirin. Ew neçare mêr reb bibîne û îbadeta hemû adetan bike. Di vir de ya pirsgirêk çi ye? Jin li gorî adetan biçe jî, dîsa ji civak û mêr rizgar nabe. Her tim jiyanê li wê dikin jehr. Eger civakek ji perçiqandin û kolekirina jinê zevk bigirê, ew civak ji aliyê zîhnî û ruhî ve nexweş e. Çarenûsa jina Ereb bi zîhniyet û adetên vê civakê ve girêdayî ye. Gelo di van şert û mercan de jinên Ereb wê çawa xweşiya jiyanê bibînin û hîs bikin?

Pirsgirêka mezin mêrê Ereb û civaka wan dibêjin kesek mîna me mafên jinê nadê wê. Lê belê gotinên mîna azadiya jin, parastina jin, mafên jin tehemul nakin ku bibhîzin an jî bibînin.

Li bajarê Tebqayê piştî Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê derbasî wêderê bû, gurûpekî mêran li hemû sazî, kolan û navendên jin û yên Rêveberiya Xweser geriyane û gotina Jin li kudere hatiye nivîsandin, bi boyaxê sîl kirine. Li ser dijîtal medya li xwe mûkir tên û dibêjin: `Ev heft salin serê me bi gotina azadî û parastina jinê gêj kiribûn. Kolanên me qirêj kiribûn. Kesek weke me mafên jinê nadê wê.`

Jinên Ereb piştî rizgarkirina Tebqa, Reqa û Dêra Zorê ji çeteyên DAIŞ`ê nû gotinên mîna azadiya jin û wekheviya di navbera jin û mêr de dibihîstin. Beşek ji jinên Ereb dema ev gotin bihîstin û saziyên jin vebûn, hêz digirtin ku destbi têkoşînê bikin û beşek jî pêkanîna vê yekê gelekî zehmet didîtin. Ji ber dizanîbûn civaka wan çiqasî di mijara jinê de hişke û gelekî zehmete vê yekê qebûl bikin. Ji xwe di hemû rewşan de jinên Ereb ruhî têne perçiqandin. Zextekî piskolojîk li ser wan tê meşandin ku roj ji wan re bibin sal. Eger temenê wan bighîje 80 salî tê wateya 29 hezar û 200 roj li pêşiya çavên wan bûye milyonên salan. Ji ber wê tirsekî wan ê mezin ji jiyanê heye. Girêdana wan a malbatî û ya bi zarokên wan ve hinekî li ser wan sivik dike. Heyanî astekî dikarin ji bo zarokên xwe her tiştî tehemul bikin lê belê ji jiyanê zêdetir berê xwe didin mirinê. Civaka zayendperest û mêr jinên Ereb dighînin asta benzînê vexwin, bi canê xwe de de bikin û agir berdin xwe. Bi agir êşa pê didin kişandin, vedimirînê. Yan jî xwe tavêjin ava Firatê û hejmarek jî xwe bi ben dixeniqîn in. Guh, çav û zimanê civaka Ereb li hemberî van buyeran girtiye. Cenazayê wan jinan bin ax dikin û kesek ciyê gora wan jî nizanê.

Hemû jinên cîhanê di ber parastina jina Ereb de berpirsyarin û divê wê ji qeydên hezarên salan rizgar bikin.



# DAIŞ'ê xwe ji nû ve zindî dike

Di dema dawiyê de rêxistina DAIŞ'ê peyameke da ku tê de şerê li dijî hikumeta Şamê ya demkî ragihand, rayedarên NY hişyarî dan li ser berfirehbûna bilez a rêxistinê û şaxên wê li Efrîqayê, bi taybetî li rojavayê parzemînê û herêma beravê ku rewşa ewlehiyê lê hîn jî pir xeternak e.

**Navenda Nûçeyan**

Lêkolînerên di kar û barên komên tundraw dibînin ku rêxistina DAIŞ'ê niha xwedispêre îstratîjiya "ji nûve bicihkirinê", ku bi taybet li deverên lawaz ji hêla ewlehiyê û herêmê ku şer û pevçûên lê hene hedef digre, da ku ji nû ve şaneyen xwe ava bike û windahiyên xwe yên mirovî û lojîstîk telafî bike, ku ji qelsbûna saziyên dewletê û lawazbûna sînorên çend dewletên beravê û rojavayê Efrîqayê sûd digre.

**Guhertina navenda operasyonan**

Li gorî Sky News'ê Texmînên rojavayî nîşan didin ku pêşketinên ewlehiyê li Sûriyê hişt ku çekdarên biyanî di rêxistina DAIŞ'ê de berê xwe bidin Efrîqayê, digel bîlançoyên piştrast dikin ku ji sedî 90 ji êrişên ku vê dawiyê ji hêla rêxistinê ve hatin idîakirin di hundirê parzemîna Efrîqayê pêk hatine, ku heta berî çend salan operasyonên rêxistinê tenê li Îraq û Sûriyê hedef digirtin.

Li gorî raporên ku ji hêla Meclisa Ewlehiya Navdeweletî hatin derxistin, hatiye destnîşan kirin ku şaxên rêxistina DAIŞ'ê di nav de "Wîlayeta Beravê" û Wîlayeta Rojavayê Efrîqayê" deverên berfireh kontrol kirine, di encamê de gelek windahiyên mirovî û koçberiya bi zorê çêbû herwiha alîkariyên mirovî hat astengkirin.

**Hejmarên bi fikar û şiyanên pêşketî**

Rêveberiya Navendî ya Emerîkayê texmîn dike ku hejmara çekdarên rêxistinê li Îraq û Sûriyê dighêje 2,500'î. Di heman demê de lêkolînên Ewropî destnîşan dikin ku hejmara çekdarên rêxistinê li Wîlayeta Beravê û Wîlayeta Rojavayê Efrîqayê dighêje 5 hezar çekdaran.

Cîgirê Sekreterê Giştî yê Têkoşîna li dijî Terorê li Neteweyên Yekbûyî, Alexander Zuev, li ser aktîvbûna berdewam a rêxistinê li Nîjerê, hedefgirtina hêzên ewlehiyê û sivîlan û beşdarbûna wê di pevçûnên bi komên girêdayî El Qaîde'yê re hişyarî da.





Di heman demê de hatiye zanîn ku rêxistina DAIŞ'ê xwedispêre teknolojiyên pêşketî, di nav de ragihandina di rêya satelîtê, bikaranîna amûrên AI û diravên dîjîtal herwiha dronên ku li Malî hatine dîtin.

Rêvebrê navenda çavdêriya pevçûnên li berava Efrîqayê Elî Kîlanî tekez dike ku rêxistina DAIŞ'ê ji toreya (Şebeke) çekdarên berê ku li Sûriyê, Lîbiyayê û Sûdanê şer dikirin sûd digre, ji ber ku şahîdiyê bêaramiya ewlehî bilind dibin.

Elî Kilanî dibîne ku Sûdan "deriyek sereke" ye ji bo derbasbûna rêxistinê di naveresta parzemînê de, li ser bingeha hevpeymaniyên îdeolojîk û eşîrî yên sînorderbasbûyî ku tevgera çekdaran û veguhestina wan di navbera herêmên pevçûnê de hêsan dike.

**Taktîkên nû**

Ji Washingtonê, lêkolînerê Emerîkî Scott Morgan balê dikişîne ser çavdêrkirina çekdarên rêxistinê yên ku ji Sûriyê ber bi beravê ve çûne herwiha tekez dike ku hin taktîkên li wê deverê ji ber zexta ewlehiyê ya kêm û xwezaya erdê encamên mezintir bi dest dixin.

Ew zêde dike ku destnîşankirina qels a sînorên dîrokî, bikaranîna rêyên bazirganiyê yên kevin û nebûna hevrêziya ewlehiyê ya bi bandor, çi ji pergalên herêmî be çi navneteweyî, di nav de Interpol jî, faktorên ku avantajek eşkere didin rêxistinê li herêmê.

**Veguhestina rêkûpêk an berfirehbûna bêdawî?**

Lêkolîner Îbrahîm Jiro yê ji Niyamî dibîne ku şêweya niha ya êrişan "guherînek rêxistinkirî" ye, ku ji qiraxên welatên Kendava Xînyayê heta naveresta Beravê dirêj dibe û hişyar dike ku nebûna bersiveke bi komî a hevrêzkirî dê herêmê veguherîne wargehek kaosê ku kontrolkirina wê dijwar bibe.

Çavkaniyên xwezayî yên beravê, qadên fireh û şiyanên ewlehiyê yên qels, herêmê ji bo rêxistinên tundrew dike qadeke vekirî, ku qonaxek tevlihevtir di şerê li dijî terorê de nîşan dide.

# Talîbanê tundiya li ser jin û zarokan qanûnî dike

**Navenda Nûçeyan**

**Hikumeta Talîbanê qanûnek ceza ya nû ku destûrê dide mêran li dijî hevjîn û zarokên xwe tundiyê bikin, pejirandiye. Ev pêkanîn tundiya nava malê qanûnî dike û şûna "sûc" mîna "meseleyek teqdîr" dabeş dike.**

Rojnameya Brîtanî The Telegraph pêşnûmeya ji qanûna ceza ya ku 60 rûpelî pêk tê, ku ji hêla Haibatullah Akhundzada, rêberê bilind ê tevgera Talîbanê li Efxanistanê ve hatiye îmzekirin, bi dest xist. Ev qanûn li seranserê Efxanistanê li dadgehan hatiye belavkirin, ku lêdana jinê wekî cezayek bi teqdîr û ne sûc destnîşan dike.

**Qanûn rastî fikarên mezin hat**

Li Efxanistan, biryar û qanûnên ku Talîbanê derxistin, rastî bertekên mezin hatin. Van rêziknameyan, di mijara paşketina mafên jinan û sînordarkirina azadiya takekesî de bû sedema fikarên mezin û nebûna mekanîzmayên parastinê herwiha tunebûna saziyên çavdêriyê balê dikşîne.



Talîbanê ragihand ku qanûnek ceza ya nû ku destûrê dide mêran li dijî hevjîn û zarokên xwe tundiyê bikin, pejirandiye. Ev pêkanîn, mîna rêziknameyek ku tundiya nava malê qanûnî dike û şûna "sûc" mîna "meseleyek teqdîr" dabeş dike, rastî rexneyên berfireh hat.

**Qanûn ji 60 rûpelan pêk tê**

Qanûn ji 60 rûpelan pêk tê û îmzeya serokê payebilind ê Talîbanê Heybetullah Akhundzada li ser heye. Ev qanûna ku ji bo dadgehên li seranserî welat mîna referans hat belavkirin, ji mêran re ji bo bikaranîna tundiya di nava malê de rayeyek mezin dide. Qanûna ku ji bo jin û zarokan mekanîzmayek parastinê ya bi bandor mîsoger nake, mekanîzmayên parastinê yên bi bandor ji bo jin û zarokan tune ne, di mijara birîndarbûna giran de cezayê girtîgehê yê 15 rojan mîna cezayê herî zêde pêşbînî dike. Qanûn, ji bo parastina jinan a ji tundiya fîzîkî, derûnî yan jî zayendî tu temînatek pêşkêş nake. Jinên ku dixwazin gilî bikin divê birînên xwe nîşanî dadgehekî mêr û hevjînê xwe bide. Her wiha qanûn, jinên ku ji tundiyê direvin û diçin mala malbatên xwe, mehkûmê sê meh cezayê girtîgehê dike. Endamên malbatê yên ku ji jinan re stargeh peyda dikin jî bi heman cezayê re rûbirû dimînin. Ev rewş dibe sedem ku hem jin û hem jî malbat rastî gefên duqat bên.

**Qanûnên berê hatin hilwişandin**

Ev qanûn çarçoveya yasayî ya ku di bin siya hikûmeta berê ya Efxanistanê de hatibû danîn, di nav de qanûna ku sala 2009'an derketibû ku zewaca bi zorê, tecawiz û şîdeta li ser bingeha zayendî sûcdar dikir û cezayên ji sê mehan heta salekê ji bo şîdeta navmalî ferz dikir, hat hiliwşandin.

Efxanîyên çîna karker, ku di bin rêza civakî de ne, bi girtin û cezayê laşî re rû bi rû ne. Qanûn bi eşkereyî cudahiyê di navbera welatiyên azad û koleyan de destnîşan dike û şertê anîna mêrekî bo dadgehê, ku pir caran sûcdar bi xwe ye, ji hêla avahîsaziyê ve ne mumkin dike.

Herwiha di qanûnê de destûr tê dayîn ku mamoste li zarokên di bin lênêrîna wan de, bidin û sînorkirina lêdanê bi birînên zêde yên wekî şikestina hestiyan, çirandina çerm û birînên giran in. Cureyên din ên şîdeta fîzîkî, psîkolojîk û cinsî ya li dijî zarokan ne qedexe ne. Herwiha xala 48'an bi eşkere maf dide bav ku zarokên ji 10 saliya xwe ve bi fîzîkî ceza bike ku ev yek wekî ji bo berjewendiya zarok tê hesibandin.

# Avesta Xabûr û Barîn Kobanê Berxwedana Serdemê, serdemî hiştin

Kêliyên Berxwedana Serdemê ya Efrînê di van rojan de beriya 8 salan dihatin jiyankirin. Di wê berxwedaniya efsûnewî de bedelên pîroz bi sekna qehremaniyê hatin dayîn; Avesta Xabûr fedayîya Efrînê û Barîn Kobanê têkoşera ku bi şehadeta xwe rûyê hovan derxist holê.

**Navenda Nûçeyan**

Fermandara fedayî Avesta Xabûr bi çalakiya xwe, di nava refên YPJ'ê de bû deng û vîna jinên azad û navê xwe di rûpelên zêrîn ên dîrokê de nivîsand. Di 20'ê Çileya 2018'an de dewleta Tirk tevî çeteyên xwe bi awayek hovane dest bi êrîşeke li ser bajarê Efrînê kir. Ev êrîş li ser sînorê herêmê bi awayekî bejahî û hewayî û bi riya çeteyên wek El Nusra, Ehrar El Şerqiyê pêk hat.

Dema ku şervanên YPJ û YPG'ê bi awayekî xurt li hemberî êrîşên dagirkeriyê liberxwe dan û parastina herêmê kirin, derbên giran li çeteyan xistin. Dewleta Tirk ji bo ku çete paş ve neçin, hemû teknîka xwe ya şer bi taybetî jî balafirên şer kir dewrê. Berxwedana li bajarê Efrînê bi beşdariya şervanan û gel, 58 rojan berdewam kir. Gelek şervanên YPJ û YPG'ê di 'Berxwedana Serdemê' de cîhê xwe girtin û bi lehengiyek mezin gihîştin asta şehadetê.

**Di temenek pir ciwan de tevlî nav refên azadiyê bû**

Zelîxe Hemo bi nasnav Avesta Xabûr, di sala 1998'an li Helebê ji dayîk dibe. Ew bi xwe ji gundê Bêlê yê navçeya Bilbilê ya Efrînê ye. Avesta li Şamê mezin dibe. Çawa ku di sala 2014'an de şoreşê nas dike, di heman salê de li Efrînê tevlî nava refên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) dibe. Avesta Xabûr di demeke kin de kesayeta xwe bi pêş dixe û bi erkên giran radibe. Li gel ku fermandareke ciwan bû, di heman demê de jî bû perwerdekarek pispor a leşkerî. Bi tevlîbûna pêngavên rizgarkirina Tinib, Keştear, Til Rifat û Um Elhûş tecrubeyên mezin qezenc dike. Di sala 2015'an derbasî saziya Yekîneyên Antî Terorê dibe. Di wê derê de zêdetir di warê leşkerî de bi pêş dikeve.

Fermandar Avesta Xabûr di axaftineke xwe de behsa armancên xwe dike û wiha dibêje: "Armanca min ew e ku ez xwe bighînim asta şehîd Zîlan û şehîd Bêrîtan." Di 'Berxwedana Serdemê' de, ji bo ku rê nede dagirkeriya Tirk û çeteyên wê, di 27'ê Çileyê de li gundê Hemamê yê girêdayî navçeya Cindirêsê ya Efrînê, li dijî tangên ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve êrişî çeperên şervanan dikirin, çalakiya fedayî lidar dixe.
**Ji ajansa Nûjinha**



Barîn Kobanê

Bi êrişên dagirkeran ên li dijî Efrîn re, gelek çîrokên têkoşîna li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ketin nava rûpelên dîrokê. Barîn Kobanê jî berxwedana xwe li navçeya Bilbilê ya Efrîn pêk anî. Emîna Omer (Barîn Kobanê) di sala 1988'an de li gundê Qirkelbên ê Helebê, çavên xwe li dinyayê vedike û di nava malbateke welatparêz de heta sala 2015'an bi 5 xwişk û 3 birayên xwe re dijî. Di zaroktiya xwe de Barîn Kobanê ji xwişk û birayên xwe cuda bû û dilnerm bû. Herî zêde nêzî birayê xwe yê bi navê Ehmed Omer bû.

Di sala 2013`an de çeteyên DAIŞ'ê derbasî gundê Barîn Kobanê dibin. Bavê wê Mistefa Omer li ser vê yekê wiha got: "Barîn li hember çeteyên DAIŞ'ê bi cesaret bû, digot ez dixwazim bi wan re bipeyivim û wan rezîl bikim." Ji ber hebûna çeteyan di gund de, malbata Emîna Omer ji neçarî koçî bajarê Efrîn dikin.

Li Efrînê Barîn Kobanê jinên Êzidî yên ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve li Şengalê hatibûn revandin, dibîne ku wan jinan xwe ji nava destê çeteyên DAIŞ'ê rizgar kiribû û xwe gihandibû herêma Efrînê ya ewle.

**'Devera ez lê, cihê namûs û şerefê ye'**

Barîn Kobanê di dawiya sala 2014'an de tev li nava refê YPJ`ê bû. Barîn Kobanê fikirên rêber Abdullah Ocalan ji xwe re kirin esas. Dayika wê Zehra El-Elo wiha qala wê kir: "Ji min re digot `Devera ez lê, cihê namûs û şerefê ye, ez ê li ser vê rêyê heta dawiyê biçim'." Barîn Kobanê Bi cesareta jina Kurd û bi qehremantiya YPJ'ê di Efrnê de heyanî kêliya xwe ya berxwedanê ya dawî şer dike û sekna xwe raber dike. Barîn Kobanê tevî hevalên xwe li hember êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Efrîn disekine û di nava rûpelên destpêkê yên Berxwedana Serdemê de bi xwîna xwe navê xwe dinivîse û digihêje şehadetê.

Cenazeyê şervana YPJ`ê Barîn Kobanê, li navçeya Bilbilê ya Efrînê dikeve destê dewleta Tirk û çeteyên wê. Wê demê gotina Barînê ya `Ev çete li dijî mirovahiyê ne' pêk tê ku çete bi cenazeyê wê dilîzin. Rastî û bê mirovahiya dewleta Tirkiyê û komên çeteyan di wir de careke din derdikeve. **Ji ajansa ANHA**

## Perwerdehiya bi zimanê xwe prensîba hemwelatîbûna wekhev û aştiya civakî ye



**Gulîstan Xalid**

Ziman ji bo jiyana mirovan hêmanek girîng e. Ziman ne tenê wekî amûrek ragihandinê ye, di heman demê de ew diyarkerek bingehîn a rêxistina civakî, bîra kolektîf û berdewamiya çandîye. Di vê çarçoveyê de, parastin û pêşxistina ziman wekî şerteke pêşîne ji bo domandina civakane.

Her civak nirx, pergalên baweriyê, kevneşopî û awayên jiyanê yên ku di tevahiya pêvajoya xwe ya dîrokî de afirandiye bi riya zimanê xwe ji nifşên pêşerojê re vediguhezîne. Ji ber vê yekê, ziman hilgirê herî girîng ê bîra kolektîf e. Windabûna ziman an tengkirina deverên karanîna wî bi xwe re hilweşîna çandî û wendakirina nasnameyê tîne. Lêkolînên li ser zimanên di xetereyê de jî nîşan didin ku dema qada jiyanê ya zimanek piçûk dibe, çanda civaka ku bi wî zimanî diaxive jî ber bi wendabûnê ve diçe. Ji bo ku civakeke di qadên perwerde, hiqûq, aborî û zanist de bi rêkûpêk bixebite, divê avahiya zimanî xurt û domdar be. Lêbelê, di civakên pirzimanî de, ne bi ferzkirina zimanekî yekane, bi rêxistina demokratîk a pirrengiya zimanî ve gengaz e. Ji ber ku qadeke zimanî ku hemî komên di nav civakê de dikarin bi nasnameyên xwe hebin, piştgirî dide pêşkeftina aştî û hevgirtina civakî.

Zimanê Kurdî jî hêmaneke bingehîn a nasnameya çandî û pêşveçûna dîrokî ya civaka Kurde. Civaka kurd xwedî kevneşopiyeke wêjeyî ya devkî û nivîskî ya dewlemend û avahiyek zimanî ya xurt e. Kurdî di warên wekî wêje, muzîk, folklor û bîra civakî de roleke navendî lîstiye. Ji ber vê yekê, parastin, pêşxistin û veguhestina zimanê Kurdî ji nifşên pêşerojê re ne tenê pêdiviyek çandî ye, di heman demê de mafek bingehîn a mirovîye jî. Dewletên neteweyî yên nûjen armanc dikin ku polîtîkayên li ser bingeha wekheviyê ji bo welatiyên xwe bicîh bînin da ku ahenga civakî û entegrasyonê baştir bikin. Di civakên pirzimanî de, yek ji rêbazên herî bibandor ji bo bidestxistina vê entegrasyonê ew e ku mafê civakên cûda yên wergirtina perwerdehiyê bi zimanên xwe were naskirin. Mafê perwerdehiyê bi zimanê dayikê parastina mafên hem takekesî û hem jî yên kolektîf misoger dike; ew piştgirî dide beşdariya kesan di civakê de bi nasnameyên xwe. Naskirin û bicîhanîna mafê perwerdehiyê bi zimanê dayikê yê civaka Kurd ewê bihêle ku parastina nasnameya çandî, hestên xwebûna civakî, pêşxistina hişmendiya hemwelatîbûna wekhev, bawerî bi têkiliyên dewlet-civakê anîn, asta serkeftin û têgihîştinê di perwerdehiyê de pêşkeve.

Di pêvajoya entegrasyona civaka Kurd bi dewletê re, perwerdehiya bi zimanê dayikê ne tenê mafek çandî ye, di heman demê de pêdiviyek perwerdehî û sosyolojîk e jî. Di encamp de Ziman hilgirê sereke yê berdewamiya çandî, yekparçeyiya sosyolojîk û bîra dîrokî ya civakan e. Ji ber vê yekê, ji bo her civakê pêdivîyek hem çandî û hem jî siyasî ye ku zimanê xwe biparêze û pêş bixe. Naskirina mafê civaka Kurd a wergirtina perwerdehiyê bi zimanê xwe ne tenê daxwazek çandî ye; ew di heman demê de pêdiviyek nirxên demokratîk, prensîba hemwelatîbûna wekhev û aştiya civakî ye. Misogerkirina mafê perwerdehiyê bi zimanê dayikê dê entegrasyona di navbera dewlet û civakê de xurt bike û dê bingehek saxlem ji bo civaka Kurd biafirîne da ku hebûna xwe ya çandî biparêze.

# Li Rojava şerê hebûnê û cenga berxwedanê

**Strêk Mihemed**

Li Rojavayê Kurdistanê ji şorşa 19'ê Tirmeh a 2012'an ve gelê Kurd li hemberî zordariya ku ji aliyê Rêjîma Baas û çeteyên DAİŞ'ê û dewleta Tirk a dagiker ve dihat meşandin tekoşîna xwe domandin. Di dema niha de jî bi êrişên hikumeta demkî a Sûriyê re re rû bi rû dimînin, lê li hember hemû êrişan û hewildana tunekirina Kurdan jî, gel bi berxwedaniyek mezin, destanên lehengiya mohra xwe li dîrokê xistin. Tu êrişan nikarîbû ku îradeya gelê Rojavayê Kurdistanê bişkîne, bi hêviyên xwe yê ji bo azadiyê û jiyanek bi rumet serkeftin bi dest xistin.

Di destpêkê de li hember hişmendiya Rêjîma Baas a tunekirina zimanê Kurdî şerkirin herwiha li hember zihniyeta osmanî ya ku dixwaze nasnameya Kurdan ji holê rabike şer kirin, di 2014'an de li hember hêza herî xeter di cîhanê de DAIŞ'ê ku hebûna mirovahiyê dikir xeteriyê di Kobanê te têk birin û niha jî hukumeta demkî, bi planê dewleta Tirk û erêkirina dewletên navnetewî dixwazin Kurdan qirbikin. Çi lê pêşiya vê plane navneteweyî girt? Kurdên li Sûriyê û Rojavayê Kurdistnê rastî êrişên qirkirinê tên, êriş li ser destkeftiyên Şoreşa Rojava a ku ji wê demê heya roja me ya îro ji bo parastina wan destkeftiyan zêdetirî 15 hezar Şehîd dane tên meşandin. Ev plana qirkirinê ya li ser Kurdan di 6'ê meha Çile de li taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê hate xuyakirin. Di wê demê de û di wê êrişê de xwastin ku plana qirkirina hebûn û nasnameya Kurdan ji wê derê destpê bikin û berê xwe bidin Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Lê li herdu taxên Kurdan bi berxwedaniya gel û têkoşîna şervanan plana navdewletî vegerî cenga berxwedanê. 42 hezar çete û bi destekdayîna dewleta Tirk li hember du taxan û 300 şervan destana lehengî û têkoşîna ji bo jiyanek bi rumet bû. Bila dijmin baş bizanibe Şêxmeqsûd û Eşrefiyê têkneçû, lê belê bi qehremaniya şervanan û Fedayiya Ziyad Heleb, Hawar, Dilbirîn, Faraşîn, Denîz û Rojbînan biserketin. Herwiha ji bo plana xwe ya qirkirinê li dijî Kurdan berdewam bikin berê xwe dan Bakur û Rojhilatê Sûriyê da ku hebûna Kurdan li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê tune bikin ji ber ku dizanin eger hebûna Kurdên li Rojavayê Kurdistanê nema li çar parçeyên din a Kurdistanê ji namîne. Bi palnekî nevnetewî û bi dayîna çira kesk ku êriş li ser Kurdan were kirin û wan di pêlên qirkirinê re derbas bikin êriş kirin. komkujî û kiryarên dijmirovî bi serê Kurdên Rojava kirin û di demek wiha de xwastin ku DAIŞ'ê vegerînin û li tevahî Rojhilata Navîn ji nû ve vejîn bikin. Tenê pirsek ji sivîlan dipirsîn tu Kurd e an na? Eger Kurd be dihat qetilkirin, parçekirin û revandin. Tê wateya ku eger tu Kurd be tu wateya hebûna te tuneye û divê were qirkirin. Kurdên li Bakur û Rohilatê Sûriyê yên ku komên çeteyan a girêdayî hikumeta demkî gihaştine wan rastî bûyeran wiha hatin. Herwiha hêvî dikirin ku li tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê plana qirkirinê berdewam bikin, lê belê li hemberî vê yekê tevahî Kurdên li sê parçeyê Kurdistanê û cîhanê rabûn ser piyan di heman demê de Kurdên li Rojava berxwedaniyek mezin dan meşandin û tevahî gel ji 7 salî heya 70'ê salî ketin nava tevgerê û seferberî îlankirin. Her Kurdekî û şervanekî li Rojava çek hilgirin û diyar kirin ku ji bo parastina welatê xwe ew hemû li ser şopa Ziyad Heleb in, gavekê paş de na avêjin û wê giyana xwe bidin, ev peyama gelê Rojava bû. Gelê Rojava bi berxwedanî û piştgirya gelê Kurd li seranserî cîhanê ev plana qirkirinê li ser Kurdan şikand. Ev nayê wateya ku xeteriya li ser hebûna Kurdan bi dawî bû, lê belê hîn jî berdewam dike, îro roj li Rojava şerê hebûn û nebûnê ye. Bi her awayî û mudexeleyê dewleta Tirk dixwaze lihevkirin, rabûna gelê cîhanê ji bo Rojava û destekdayîna dewletan ji gelê Kurd ya li Rojava re vala dervixîne. Divê gelê Kurd li seranserî cîhanê heya ku mafê gelê Kurd a li Rojava bi awayekî resmî û di zagona parastina navnetewî ya cîhanê de neyê prastin ranewestin. Hêjayî gotinê ye li Rojava di pêlên qirkirina Kurdan de tililiya berxwedanê û şerê man û nemanê.



# Kobanê di nava dorpêçê de êşa kêmbûna xwarin û dermanan dikşîne

Bêtirî mehekê li ser dorpêçkirina Kobanê derbas bû, bi dirêjahiya vê demê re bangên herêmî û navneteweyî ji bo vekirina rêyan û destûrdayîna gihandina lezgîn a alîkariyên mirovî zêde dibin.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Ji 20'ê Çileyê ve, komên girêdayî hikûmeta demkî ya li Şamê dorpêçek tevahî li ser bajêr ferz kirine, ku di encamê de şert û mercên jiyanê yên zêdetirî 600 hezar sivîlan li Kobaniyê û gundewarên derdora wê xirabtir bûne û hişyarî jî hatiye dayîn ku krîz dikare bibe karesatek mirovî ya berfireh.

Rêyên ku diçin bajêr hîn jî girtî ne, di heman demê de rê li ber ketina xwarin û pêdiviyên bijîşkî tê girtin û nexweşxane ji ber kêmbûna giran a dermanan, nemaze dermanên ji bo nexweşiyên belavbûyî û pêdiviyên ji bo rewşên awarte, ji bilî kêmbûna girîng a pêdiviyên bijîşkî, bi kapasîteya herî kêm dixebitin.

Gel ji kêmbûna hema bêje bêkêmahî ya şîrê zarokan dikişîne, ku jiyana bi sedan zarokan dixe xeterê di nav nîşanên zêdebûna nebûna alternatîfan de û tê payîn ku rêjeyên nexweşiyê , nemaze di nav zarok û kal û pîran de, zêde bibin, ger rewş bi vî rengî berdewam bike.

Dorpêç her wiha bû sedema kêmbûneke giran a materyalên germkirinê, ku êşa niştecihan, bi taybetî di kamp û stargehan de, girantir kir. Ji ber kêmbûna sotemeniyê û xizmetguzariya elektrîkê û avê qut bû, ku jiyana rojane ya di nav bajêr de hîn dijwartir kir.

**Rewşa tenduristiyê: Hişyariya hilweşîna nêzîk**

Di 1'ê Sibatê de, Nexweşxaneya Kobaniyê zêdetirî 20,000 nexweş pêşwazî kiriye, ku 5,515 ji wan di rewşeke zehmet de ne, di heman demê de ji ber kêmbûna dermanan û dorpêçkirinê zêdetirî 10 kesan mirine. Li Kobanê şeş nexweşxane hene, dudo ji wan taybet in û yek jî bi Desteya Tenduristiyê ve girêdayî ye. Lêbelê, hemî ji ber kêmbûna dermanan, her wiha hejmareke zêde ya nexweşan, ku piraniya wan ji bûyerên jehrîbûna avê dikişînin, ji rewşên dijwar dikişînin. Karmendên tenduristiyê yên li bajêr hişyar dikin ku dorpêça berdewam pergala bijîşkî ber bi hilweşînê ve dibe. Ji destpêka dorpêçkirinê ve, ji bilî mîqdarên sînorkirî yên ku wekî ne bes têne binavkirin, ti sewqiyatên bijîşkî yên birêkûpêk nehatine. Dermanên pêwîst, herwiha dermanên ji bo nexweşiyên belavbûyî ên wekî şekir, tansiyona bilind û nexweşiya dil, xilas bûne. Nexweşên talasemiyê, ku piraniya wan zarok in, ji ber kêmbûna yekîneyên xwînê bi du tehdîdan re rû bi rû ne, ji ber ku ew hewceyê veguhestina xwînê ya birêkûpêk in ku nayê paşxistin. Ji ber ku niştecihên bajêr ava bîrên nepaqij bikar tînin, belavbûneke berfireh a nexweşiyên madê ên bi vereşîn û îshal re hatine tomar kirin, ku ji du hezar bûyeran derbas bûye. Ev di demekê de tê ku nexweşxane ji kêmbûna dermanên zehmetiyan dikişînin.

Piştî ku rewşa bajar ji ber nexweşiyeke zextî xirabtir bû, Dildar Rêzan Hiso yê 12 salî winda kir. Qedexeyên dorpêçkirinê rê li ber veguhestina wî ji bo nexweşxaneyên li Helebê girt. Mirina wî ne bûyerek tenê bû, lê belê trajediyek mirovî ya dijwar bû ku krîzek nîşan dide ku bandorê li bi dehan nexweşan dike ku li benda şansek derbasbûna sînor in, şansek ku dibe ku qet neyê.

**Sotemeniya kêm û dabînkirina xwarinê kêm dibe**

Li gel krîza tenduristiyê, kêmbûna sotemeniyê jiyana rojane dixe tengasiyê. Hejmarên sînorkirî bi rêyên nefermî dikevin hundir û bi bihayên zêde têne firotin, di heman demê de niştecih li îstasyonên kêm ên berdest di rêzên dirêj de radiwestin, bi hêviya ku têra xwe ji bo germkirina malên xwe an xebitandina jeneratorên biçûk peyda bikin.

Bazar, ji ber vê yekê, ji kêmbûna sebze û kelûpelên bingehîn êş dikişînin û biha bi girîngî bilind dibin. Ev yek bi hatina bi hezaran mirovên koçber ên ji gundên cîran ber bi bajêr ve tê zêdekirin, ku çavkaniyên jixwe sînordar hîn bêtir bar dike.



**Alîkarî ne li gorî mezinahiya krîzê ye**

Tevî ku di meha Sibatê de bi dehan kamyonên alîkariyê ketine deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, tevî hin ji wan gihîştine Kobanê, ji bilî mîsyoneke bijîşkî ji Herêma Kurdistanê jî, Çavdêrgeha Mafên Mirovan a Sûriyeyê piştrast dike ku tiştên ku hatine, tewra pêdiviyên herî kêm ên ku di mehek tevahî ya dorpêçkirinê de kom bûne jî, nemaze di rewşa tenduristiyê de, nagire nav xwe.

Her ku meha yekem ber bi dawî ve diçû, bangên ji bo vekirina korîdorên mirovî yên daîmî û bê şert û merc zêde dibûn da ku ketina birêkûpêk a derman, pêdiviyên bijîşkî û xwarinê misoger bikin û rê bidin ku rewşên krîtîk ji bo dermankirinê derkevin.

Di navbera kêmbûna dermanan, xetên sotemeniyê û li benda karwanên alîkariyê yên ne bes de, Kobanê rojên xwe yên dijwar di bin dorpêçê de derbas dike, di heman demê de niştecih ditirsin ku dem bi xwe bibe dijminekî din, lêçûna mirovî girantir bike û berxwedana bajêr bêtir biceribîne. Bajarê Kobanê, ku berê ji ber şer û koçberiyê êş kişandiye, hîn jî bi pirsgirêkek mirovî ya nû re rû bi rû ye ku jiyana bi sed hezaran niştecihên wê tehdît dike, di nav bêdengiya navneteweyî ya li ser tiştên ku diqewimin û qedexeyên berdewam ên li ser wê hatine ferzkirin.

# 'Parastina Rojava parastina hebûn û rûmetê ye'

**Viyan Egîd/Hesekê**

**Ciwanên Hesekê diyar kirin ku li dijî êrişan wan ruhê seferberiyê yê li kantona Cizîrê xurt kirin û gotin, "Tevî ku niha agirbest hatiye îlan kirin û aramî çêbûye, lê dîsa jî parastina civakê erka me hemûyan e û heya roja îro dewam dike, parastina Rojava parastina hebûn û rûmetê ye."**

Bi ruhê Şerê Gel ê Şoreşgerî ku li seranserî Rojava xwe nîşan dide û ji aliyê jinan û gelan ve parastina taxan berdewam e. Gelê Hesekê heya roja îro bi şev û roj parastina tax û kolanên xwe dikin. Herwiha ruxmî ku agirbest û Lihevkirin di navbera Hêzên Sûriya Demokiratîk û hikumeta demkî ya Sûriyê de hatiya çêkirin, dîsa jî gelê kantona Cizîrê parastina xwe dewam dikin. Di derbarê parastin û seferberiyê de ciwanên bajarê Hesekê ji Rojnameya me re axivîn.



Ciwan Mihemed



Diyar Mihemed

**'Parastin ji nan û avê giringtire'**

Ciwan Mihemed da zanîn ku parastin erka wan hemiyane û wiha pêde çû: "Ji bo ku em jî Şerê Gelê Şoreşgerî û parastina Kantona Cizîrê bikin, di heman demê de ji bo ku bajar û gundê me bi ewle bin, em bi şev û roj derdikevin parastinê. Her kes tax û bajarê xwe biparêze. Di kantona Cizîrê de jin û mêr mil bi mil ji bo ku herêma me bi ewle bin, parastina taxan û bajaran dikin. Dema ku di taxê de kesek xerîb tê dîtin bala me tevan dikşîne, li vir jî em bi wan re lêpirsîn dikin ku ji kurin û ji kur hatine li gor wê em tevdigerin, da ku tevlîhevî di taxên me de çênebin. Parastin ji hemû aliyan ve dewam dike."

**'Werin em bi hev re parastina bajar û gundên xwe bikin'**

Ciwan Mihemed di dawiya axaftina xwe de bang li her kesî kir ku di vê pêvajoyê de li ser bingehê ruhê seferberiyê parastina taxên xwe bike û wiha bi dawî kir: "Gerek her kes bibe endamê Hêzên Parastina Civakê. Ji 7 salî heya 70 salî. Ji ber ku îro roja parastina Rojava ye û gerek em li ser bingeha seferberiyê tevbigerin. Her mirovek li gor temenê xwe çi erk jê tê xwestin pêwîste ku pêkbîne, ji ber ku xwe parastin ne tenê di demên şer pêwîst dike, parastin bûye asasê jiyana me. Lewma her gav û kêlî pêwîst e em di nava parastinê de bin. Çi ji milê agahî dayîn, parastin û alîkarî dayîn, herkes dikare tiştekî ji herêma xwe re bike. Em dibêjin çi jin û mêr, werin em bi hev re mil bi mil parastina xwe bikin."

**'Em îro parastina hebûn û rûmeta xwe dikin'**

Di heman çarçoveyê de Diyar Mihemed da zanîn ku parastina bajar û gundan erka me ye û wiha anî ziman: "Berxwedan roj bi roj mezintir dibe. Jiyana ku bê parstin be, ew jiyan bê wate ye. Xweparstin erka herî bingehîne. Ji ber wê em dibêjin xweparstin di vê rewşê de ji bo me ji av û xwarinê girîngtire. Em ciwan, dayik, jin û bavên Kurd di her xak û kolanekî de parastinê dikin, parastin ji bo me bingehê jiyana azad e, em piştgiriyê didin şervanên xwe yê ku niha di çeperên şer de parastina xaka Rojava dikin, ji ber vê yekê em li pişta wane, di heman demê de emê heya dawî destekê bidin wan, em îro parastina hebûn û rumeta xwe dikin. Di dawiyê de em dibêjin, dijminê hov çidike bila bike, Kurd wê hebin û tune nabin. Wê ji zarok hata kal û pîrên me parastina xwe û gelê xwe bikin. Yan mirin yan serkeftin. Em tu carî tune nabin, wê her kurd hebin û serkeftîbin."

# ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk yekalî ye’

**Endamê Rêveberiya Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo Ferzende Munzur diyar kir ku ev saleke li ser banga dîrokî ya Rêber Apo re derbas bûye û wiha got: “Ev bang ji bo pêvajoyek nû di navbera Kurd û Tirkan de bû, lê pêkanîna wê yekalî ma.”**

**Aryena Hesen/Qamişlo**

Di 27’ê Sibata 2025’an de Rêber Apo banga “Aştî û Civaka Demokratîk” kir, ev bang li cîhanê û Rojhilata navîn dengvedaneke dîrokî çêkir. Lê ji bo pêkanîna vê bangê di nava salekê de tenê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) gav avêtin û dewleta Tirk tenê di gotinan de ma. Niha dibe salek ku Rêber Apo banga “Aştî û Civaka Demokratîk” kiriye, lê heya niha ti pêşketin di milê dewleta Tirk de çênebûne.

Di vê çarçoveyê de Endamê Rêveberiya Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo Ferzende Munzur ji Rojnameya me re axivî.

### ‘‘Salek li ser banga Rêber Apo ya “Aştî û Civaka Demokratîk re derbasbû”

Ferzende Munzur da zanîn ku Rêber Apo di 27’ê Sibata 2025’an de banga “Aştî û Civaka demokratîk” kir û wiha got: “Ev saleke li ser banga dîrokî ya Rêber Apo re derbas bû. Ev bang ji bo pêvajoyek nû di navbera Kurd û Tirkan de bû. Ev pêvajo ne li ser esasê kesekî winda kir û kesekî jî qacenc kir, lê belê li ser perensîba ku herkes qezenc bike û atmosferekî guncaw ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd di çar dewletên sereke yên Rojhilata Navîn û ji bo demokrasiya Rojhilata Navîn e. Ev banga ku Rêber Apo pêşkêş kiriye bala her kesî li cîhanê kişand, herwiha helwestên xwe jî nîşan dan, Neteweyê Yekbûyî, serokê meclîsa yekîtiya Ewropayê, serokê Amerîkayê, Rûsya di heman demê de rewşenbîr, siyasetmedaran di Rojhilata Navîn de gelek welatan erênî dîtin. Ev banga “Aştî û civaka demokratîk” a Rêber Apo hêviyek mezin avakir.”

### ‘‘Gava yekemîn a dewleta Tirk divê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo be’’

Ferzende Munzur tekez kir ku Banga Rêber Apo piştî banga Dewlet Baxçelî bû û wiha pê de çû: “Dewlet Baxçelî bang kir ku Kurd û Tirk biratiya wan a hezarê salan e. Rêber Apo bila şer bi dawî bibe û Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) xwe fesix bike, çareserî were kirin, ji Rêber Apo re mafê hêviyê were dayîn û dakeve di perlemanê de biaxive. Bi vî rengî



Rêber Apo insîyatîf girt û gavên stratejîk avêtin, Manîfestoya “Aştî û Civaka Demokratîk” ji PKK’ê re şand û kongreya 12’emîn a PKK’ê li ser wî esasî hate lidarxistin. Herwiha li ser vê bingehê gava yekemîn Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) xwe fesixkir. Di vê mijarê de divê her kes û gelê me bizanibin ku partiyên siyasî wesîletin ji bo bihgînin armanca gelê xwe. Armanca PKK’ê azadî, demokrasî û mafê gelê Kurd e. PKK’ê roleke dîrokî lîst, fesixkirina PKK’ê ne dawiya têkoşînê ye, lê belê destpêkek ji têkoşînekê ye. Ev saleke dilopek xwîn di hundir Tirkiyê de nehatiye rijandin ev jî destpêkeke serkeftîye di milê aştî û rawestandina şer de.

Gava duyemîn komek ji 30 Gêrîlayan çekê xwe şewitandin, ev jî nayê wateya ku çekê xwe radestkirin, lê belê ji bo çareseriya demokrasî û aştiyê ye. Di vê salê de hemû mercên ku ji Rêber Apo û tevgera azadiyê dihatin xwastin pêk anîn. Heta ku rayedarê dewlet baxçelî got ez ji Rêber Apo memnûnim. Pêwîst bû ku gave yekemîn a dewleta Tirk li beramber vê bangê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ba, ku mafê hêviyê pêk bihata û daketa perlemanê da ku biaxive.”

### ‘‘Gav yek alî maye’’


Ferzende Munzur destnîşan kir ku gave duyemîn divê zagonek ji bo PKK’ê derbixista û wiha domand: “Dewleta Tirk divê piştî ku PKK’ê xwe fesixkir û koma ku çekên xwe şiwitandin pêwîste ji bo wan zagonek pêşkêş kiriba ku bikaribin bi awayekê azad siyasetê bikin, lê mixabin dewleta Tirk tenê gavek avêt komisyon û komîte avakirin, ew jî temam nekirin. Herwiha dema ku tu behsa xuşk û biratiya gelan dikî, divê ku rastiyê qebûlbikê dibêjin em û Kurdan bi hezarê salan birane. Lê ev zêdetirî sed sale înkar û qirkirina Kurdan di plana dewleta Tirk de ye. Di heman demê de li hember Kurdan zimanekê tûj bikartînin. Di pêkanîna aştî û civaka demokratîk de tenê gav ji yek alî ve hatin avêtin, Rêber Apo û tevgera azadiyê gavên dîrokî ji bo çareseriyê avêtin, ev salek di ser banga Rêber Apo re derbas dibe, lê hîn jî dewleta Tirk gavek temam neavêtiye.

### ‘‘Di nava salekê de gelek kar û xebat hatin kirin’’

Ferzende Munzur diyar kir ku Di nava salekê de gelek hewildan çêbûn û wiha got: “Ji bo pêkanîna banga Rêber Apo gelek hewildanên me di milê siyasî, diplomasî, zagonî, Fikirî, ragihandinê û gelêrî jî çêbûn. Ji bo piştgiriya vê pêvajoyê me semîner lidarxistin, herwiha me name ji Dewlet Baxçelî, Erdoxan, neteweyên yekbûyî, Rêxistina mafê mirovan a neteweyên yekbûyî, meclîsa Awropa, komîteya wezîrên Awropa, serokê welatên Ereban di Rojhilata Navîn de û hemû serokên dewletên ku cihê xwe di kompiloya li ser serokatî de digirtin û ji bo dewletên mezin di cîhanê de şandin ji bo ku helwestên xwe serersat bikin. Herwiha malpera civakî ya Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo heye, ku dê te nivîs û çalakiyên ji bo Rêber Apo bi zimanê Kurdî û Erebî tên parvekirin. Herwiha konferans û semîner hatin lidarxistin, Di heman demê de nivîs û gotinên Rêber Apo me belav dikirin. Herwiha ji bo rewşa Rêber Apo em hertim hişyar bûn û me dişopand. Rûpeleke li ser youtube hat amadekirin ku têde dîmenê Rêber Apo pêşkêş dikin, di hin deman de em civînan ji gel re çêdikin. Herwiha gelek kesayetên navdar, şêwirmend, nivîskar yekîtiya ragihandina cîhanê ya Erebî û rewşenbîrîn ji Misrê, Sûriyê û Rojhilata Navîn tevlî vê bangê û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bûn.”

### ‘‘Êdî dem hatiye ku dewleta Tirk gavan bavêje’’

Endamê Rêveberiya Insiyatîfa Sûrî ya Azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo Ferzende Munzur axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Hin şande ji Vetîkan, Fransa, Almanya, û pêkhateyên xiristiyan, Ermenî, Êzîdiyan jî hatin herwiha me jî serdana wan kir. Salek bi kar û xebatê tijî bû. Rêber Apo di hevdîtina xwe ya dawî de dibêje êdî dem hatiye ku derbasî pêvajoya duyemîn a dîyalogê bibin, ev jî girîng û erêniye. Ev pêvajo wê ji bo tevahî Kurdan, Rojava û Tirkiyê re baş be. Dewleta Tirk sed sal li ser esasê yek netew, al û ziman e, ev jî zihniyeteke pir hişk e, ev jî têkoşîneke gelek mezin jê re divê û 50 salin li hember vê yekê têkoşîn tê meşandin. Êdî dem hatiye ku dewleta tirk gavan bavêje, eger gav neyê avêtin pêvajo bi sernakeve. Herwiha Kampanya “Ez jî dixwazim bi Abdullah Ocelan re hevdîtin bikim” 3 hezar 621 rewşenbîr, akademisyen, siyasetmedar, mafnas, bijîşk û Rojnemevan tevlî vê kampanyê bûn.”





## Rapora Komîsyonê

**Farûk Sakik**

Salek temam bû ku pêngava ‘aştî û civaka demokratîk’ dest pê kiriye. Di destpêkê de hêviyê mezin hebûn da ku doza Kurdistan ya bi salan e di rojeva Tirkiyê de ye wê bihata çareserkirin. Gotinên wan hebûn. Di rojên destpêkê de digot; “kê dem me Kurd red û înkar kir, we demê me winda kir.” Her wek poşman bûne. Red û înkara kurdan êdî wê bidin seknadin. Kurdan têkoşînek dabûn û bi dewleta Tirkiyê, nasnameya xwe dabûn qebûlkirin. Kurdan şerê xwe da seknandin û derbasî entegrasyona demokratîk bûn.

We çikir? Li meclisê komîsyonek avakir. Karê ku dikaribûn di 2 mehan de temam bikin, 9 meh dirêj kirin. We behsa hesasiyetên civaka xwe ya nijadperest kir û êrişî nirxên Kurdan yên pîroz kir. We daxwaz û armanca têkoşîna Kurdan ya bi salan, da aliyek. We di rapora komîsyona xwe ya tirsonek de peyvek ji bo Kurdan bicîh nekir. Hetanî peymana 29’ê Çileyê ku li Rojava di navbera Kurdan û hikumeta Şamê de hatî îmzekirin, sedemên pêşneketina pêvajoyê we QSD nîşan da. Bi peymana Rojava pêngava derbasî qonaxek nû dibû. Rêber Apo di hevdîtina xwe ya 29’ê Çileyê de digot; “Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk pêvajoyek e ku her tim xwe ji nû ve dinirxîne, stratejîk û taktîkên xwe diyar dike. Ez vê civînê wekî civînek destpêkê ya entegrasyonê dibînim”

Piştî peymanê we çikir? Waye hûn dîsa vegeriyane behsa hincetek nû dikin. Dibêjin hetanî ku ji aliyê artêşê û îstixbaretê ve hebûna PKK ya bi dawî buye, neyê teyîtkirin, em derbasî qonaxa duyem nabin.

Ji xwe ew komisyon bi raporê xwe yê tirş û kefikî nîyeta xwe eşkere kiribû. Rapora ku pêşkêşî meclisê hat kirin de, hêvî tunebû. Her tişt muglak hatî nivîsandin.

Kurdan jî dikaribûn bibêjin hetanî zimanê Kurdî nebe fermî û dibistana serate hetanî zaningeha nebe zimanê perwerdeyê, em gavên duyem nebin. Lê berevajiyê vê yekê behsa entegrasyona demokratîk kir.

Ji ber vê yekê, cihê yekem ku divê dest pê bike, entegrasyona demokratîk e, ango ji nû ve avakirina civakek ku mirov hevdu wekî xwe qebûl bikin. Rêz li mafên hevdure bigirin û heta ji bo mafên yên din bi awayekî çalak jî bixebitin. Ev tam ew e ku Rêber Apo wekî pêvajoyek bi nav kir. Ger di vî warî de zû tedbîr neyên girtin, ne tenê ji bo Tirk û Kurdan, wê ji bo hemû komên cûda bibe sedem ku nikaribin li Tirkiyeyê bi hev re bijîn. Ev demek dirêj e, li Tirkiyeyê hişmediyek wisa peydabû ku beşek girîng ji vê civakê ji êşa Kurdan kêyfxweş dibûn.

Bi taybet di rojên li Rojavayê Kurdistan êrişên qirkirinê destpêkirin, dixwestin ku ev êş girantir û bêdawî be. Plana qirkirinê dewam bike.

Bûyerên li Rojava û bertekên raya giştî ya Tirkiyeyê li hember wan êşan, îbret bû.

Ev hemû bandorek kûr li ser Kurdan dike û dibe sedema şikestina îradeya wan a ji bo jiyana bi hev re.

Çerxa 100 salî ya înkar(aliyê dewleta Tirkiyê) û serhildanan(Kurdan) bi rêya entegrasyoneke erênî were berevajîkirin, an jî têkiliyên di navbera gelên Tirk û Kurd de dê roj bi roj xirabtir bibin.

Ocalan vê yekê dibîne û dîsa jî şansek dide gelan. Ew wek Erdogan û dewleta derveyî norm tevnagere. Berpisyariyek wî heye û xwe feda dike.

Raporên xwe li gor keyfxweşkirina wan kesên ku ji êşa Kurdan zewq digirin, nenivîsin. Li benda teyîtkirina îstixbaratê û eskeriyê nemînin. Roj were, wê pir dereng be. Formula çareseriyê heger li gel we tunebin derbasî Îmrali bibin.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsiv**

Helbestvan Ehmed Huseynî
“Şêxê helbestvanên Rojavayê Kurdistanê û dengê gelê Kurd.”

Helbestvan û nivîskarên kurd yên hemdem û neteweyî di parastina nirxên miletê kurd û parastina nasname, ziman û mîrata çandî ya wî de roleke sereke lîstine. Di dîrokê de li hemberî hewldanên tunekirin û çewisandinê bûn parêzvanên bîrdankê û stûna berxwedana çandî.

Tevî qedexe û astengiyan ,wan bi zimanê xwe yê dayîkê dinivîsandin û helbest, roman, gotar û rexne kirin pir ji bo parastina nasnameyê û gihandina wê ji nifşên paşerojê re . Wan trajediyên gelê xwe û têkoşîna wî bi belge kirin, gotin kirin çek û helbest kirin ronahiya hêviyê û bi berhem û nivîsên xwe dengvedana pirsgirêka Kurd gihandin qadên cîhanî.

Di nav van pêşengan de helbestvan Ehmed Huseynî derdikeve pêş, ku pênûsa xwe ji bo xizmeta gelê xwe û doza wî terxan kiriye û navê wî bûye sembola hişyarî û çandê û tekez dike ku peyv ne tenê tîpên belawela ne, lê pirek e ku netew ji tarîtiya zilmê digihînê ronahiya jiyan û mayînê.

Helbestvan û rojnamevanê kurd Ehmed Huseynî di sala 1955’an de ji dayîk û bavek kurd (Tewfîq û Fatima) li navenda bajarê Amûdê hatiye dinyayê , ew bajarê ku yek ji ronahiyên wêje, huner û hişyariya neteweyî ya kurdî bûye û niha jî dibe.

Di malbateke welatparêz, rewşenbîr û girêdayî bi nirxên resen ên kurdeyatiyê ve mezin bû, ku ruhê hezkirina ji bo xakê û baweriya bi nasnameyê di nav wan de çand bû û hevrêzîyek di navbera pakbûna giyan û kûrahiya çandê çêkir bû , wî kurdayetî ne tenê hema nasname didît , lê çarenûseke ku di bîr û wijdanê de ye, wî xaka Kurdistanê pîrozî dît û di zanîn û zanistê de de peyam û armanc dît.

Ev jîngeha yekem a malbatî bingehek xurt ji kesayetiya wî re çêkir, û hevsengiyek di navbera ruhê welatparêzî û exlaq de , û vebûna ji çand û zanistê de û girêdanek kûr bi doza gelê xwe re çêkir, mal ji bo wî dibistaneke yekem bû, ku jê re bingehên dilsoziya bi axê, hezkirina welat û baweriya ku peyv dikare bibe pirek di navbera paşerojê û îroyîn de û herwiha dikare nasnameya kurdî di rûyê jibîrbûnê de ,biparêze û zindî bihêle .

Wî zarokatiya xwe di kolanên kevar ên Amûdê de derbas kir, ku her sibeh bêhna nanê tenûrê yê germ jê dibariya û henaseya gul û kulîlkan bi bêhna xewnên şewitîn di sînemaya bajêr de tevlihev dibûn , xweliya wê hê jî çîroka giyanên bêguneh vedibêje ku hilkişiyane bihuştê, di dilê miletê de lekeyek nemir û birînek xwînrij ku qet sax nabe hiştiye.

Ehmed mezin bû di nav rewşeka xemgîniyê de, ku bi çirûskeke serbilindiyê ve ronî bû, xemgîniya windabûn û trajediyê û serbilindiya ku ji bajarekî ku ji helemorê ( rimad) jiyaye, her dem bi hişyarî û rûmetê hildipere û dengê azadî û xweparêziyê di giyan de dixemilîne.

Ew di jîngeheke tije bi ruhê welatparêziyê mezin bû, ku sirûdên neteweyî û lavijên olî bi awazên jinan û stranên palevanan re li zeviyan têkilhev dibûn , û herwiha helbestên helbestvanan bi dengê cotkaran re di demsalên çinînê de , di gel xewnên azadiyê di qadên têkoşînê de tevlîhev dibûn.

Ji bo Ehmed Hesenî, Amûdê zêdetir bû ji bajarê zarokbûnê; ew bû çavkaniyek ji hişmendiya wî ya pêşîn, û penagehek ji bo hûnandina peyv û tîpên wî, û neynikek ku giyanê wî afirand û çirûskek ku agirê wî yê helbestvanî vêxist.

Li wir,ku trajedî bi hêviyê re û xemgînî bi serbilindiyê re dikeve nav hev, taybetmendiyên wî yên yekem hatin afirandin wekî helbestvanek ku ji birînên bajarê xwe yê ku bi tîpên bi êş vedijinin û herwiha mîna rojnamevanek ku ji dengên wan hêza gotinê û dilpakiya peyamê werdigire, lewra gotinên wî bûne pirek di navbera êş û azadiyê de, di navbera bîr û xewnê de, û bûne mîna şemalekî , rê li ber şopînerên rastiyê û bedewiyê ronahî dike.

Amûdê ne bajarekî asayî bû ; Belê, ew dibistaneke zindî ya hişyarî û bîranînê bû , dagirtî ji mîrasê çandî ku bûye sembol û nasnameyeke rastî, tije ji helbestvan, hunermend û ramanwerên mîna: (Selîm Berekat, Heysem Huseyn, Mihemed Nûr Huseynî, Dilawarê Zengî, Mihemed Efîf Huseynî, Cemîl Rawî ,Munîr Debax,Tewfîq Huseyînî ,Rifaat Darî, Yûsif Çelebî..) û gelek kesên din ku asîmanê wêje û hunera kurdî ronî kirin.

Gelek hunermend, helbestvan û nivîskarên kurd, ji kaniyên wê yên xweşav, bingehên helbestê, zanistên awazê , vegotina çîrok û romanan hîn bûne . Wan peyv kirin pirek, huner kirin çekek, û bîranîn kirin kelehek ji nifşên paşerojê re.

Ji kolanên wê peyv wek çûkan li asîmanan difirîn û ji malên wê awazên dengbêjan daketin li çiya, gelî û deştan û digihêjin her malên kurdan û ji çivat û kombûnên wê çîrok û roman bi xêzên ronahiyê ku nayên vemirandin dihatin hûnandin.

Ehmed Huseynî xwendina xwe ya seretayî, amedeyî û navîn li bajarê Amûdê qedand , piştre xwendina xwe ya bilind li zanîngeha Şamê beşa Felsefeyê domand û di sala 1983’an qedandiye .

Lê deriyên ku wî bi xwendina zanîngehê xeyal dikir, li ber wî hatin girtin û bi biryarên qedexe û dûrkirinê, ew neçar ma ku karekî bike ne li gorî hêvî û daxwazên xwe û ji ber vê yekê mîna gelek ciwanên kurd ên wê demê, riya koçberiyê ber bi Ewropayê ve hilbijart.

Ehmed Huseynî di sala 1989’an de ber bi Swêdê ve çû , êşa dûrbûn û hesreta zarokatiyê di dilê xwe de hilgirt,li pey xwe hişt, hezkiriyên xwe û bîranînên ku hatin neqişandin di quncikên Amûdê de û çavên ku ji hêsirên hesreta welat, hêvî û xeyalê tijî bûn.

Lê sirgûnê ji dilê wî dernexist xweparêziya wî, lewra dengê wî di qada wêjeyî û çandî ya kurdî de berdewam ma , dinivîsand, diweşand û di televizyonên kurdî de derdiket, û bernameyên çandî yên ku bêhna welatekî dûr hildigirt pêşkêş dikir.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re, hesret û bêrîkirin ji kûrahiya dilê wî şiyar bû û vegeriya welatê xwe û li bajarê Qamişlo xebatên xwe yên wêjeyî û çandî di nav gelê xwe de li dar xist, beşdarî di desteya rêvebir ya Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê de bû, û di kanalên Rojava de mîna “Ronahî û Çira TV” wek amedekarê bernameyan kar kir, da ku peyvan bike pirek di navbera sirgûn û welat de û dengê xwe bike şemalek bo hêvî bibe.

Hewesa wî ya wêjeyî û çandî di temenekî biçûk de dest pê kir, bi saya jîngeha wêjeyî û rewşenbîrî ya dewlemend ku li derdora wî, tevî bandora malbata wî, ji helbestvan, rewşenbîr û nivîskaran û jîngeha civakî ya ku tê de dijiya.

Çûyîna her du helbestvanên Kurd Fesîh Seyîda û Kesra Ebdî di du bûyerên cuda de, bandoreke mezin li ser wijdanê wî kirin, ev yeke bo sedema pêxistina çirûska nektara helbesta wî ya bi zimanê Kurdî û hiştin ku derbirîna hestên xwe bike bi rêya helbestê .

Herwisa Huseynî bi kûrahî ketibû bin bandora sembolên kurd ên mezin di dîroka wêjeyê de, bi taybetî Cegerxwîn, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Tirîj , afirîneriya wan di avakirina hest û hişmendiya wî ya edebî û çandî û dewlemendkirina ezmûna wî ya rewşenbîrî de rolek girîng lîst.

Ji sala 1980 ‘an ve, wî dest bi nivîsandina helbestê kir, rêwîtiyeke afirîner a dewlemend ku bi dehsalan dirêj kir damezrand.

Wî helbest bi hemû şêweyî nivîsandine ji helbesta kilasîk a bi rêzbend û kêşe heya bigihê helbesta nûjen , azad û pexşan, û di şêwazê helbesta nûjen de navdar bû, heta ku jê re digotin Şêxê Helbesta Nûjen.

Huseynî gelek dîwanên helbestî bi zimanê dayika xwe weşandin, di helbestên xwe de, wî mijarên têkoşîna neteweyî, nasname, bêrîkirina welat û serpêhatiya xerîbiyê bi awayekî hestyar têgihandiye.

Herwisa di xebata xwe de azadî jî kiriye mijareke bingehîn, di dema kariyera xwe ya ramyarî ,rewşenbîrî û çandî ya dewlemend de, wî şopên zelal hiştin di rêya dîwan û berhemên xwe yên edebî yên çapkirî de , ku bi zimanê Tirkî, Îngilîzî, Almanî, Swêdî û Erebî hatin wergerandin.

Ji dîwan û berhemên wî yên herî navdar ên hatîn weşandin:

1- Mistek Ji Şîna Bêcir – Stockholm, 1990
2- Bi Xewna We Pênûsê Dilorînim Stockholm, 1993
3- Rono û Sirûdên Bêrîkirinê – Stockholm, 1994.
4- Sîriskên Hesinî (Selîm Berekat)1997’ wergerandin.
5- Bazbend .
6- Kewname .
7- Nimêjgeha Xewnê .
8-Dîwan (Berhemên Giştî )- Istanbul,2002.
9- Bajarê Dirinde – 2003
10- Ronaya .
11- Navekî Kuştî Ji Navên Te Yên Kesk Bûn.
12- Şengalya .
13- Mohrên Reşebayan .
14- Çend Dîmenên Xemgîn ên Kurmanciya Nivîskî 2004.
15- Destên Dûr, Pêjnên Nêzîk (2009)
16- Sibehê Dûr, Şevên Nêzîk (2011).
17- Pirtûkên Reş, Pirtûkên Kesk (2013)
18- Gotar û Hevpeyvîn.



Rola Ehmed Huseynî ne tenê bi nivîs û helbestê ve sînordar bû , herwiha di warê rojnamegerî û çanda kurdî de jî berfireh bû. Di sala 2001ê de dest bi beşa çandî ya rojnameya “Armanc ”ê kir, rojnameyeke ku li paytexta Swêdê, Stockholmê dihat weşandin.

Her wiha piştî serhildana sala 2004’an li herêmên Rojavayê Kurdistanê, tevî rewşenbîrên din ên wekî Hoşeng Biroka û Reşîd Heso, bi armanca yekkirina xebatên rewşenbîrên kurd ên li derveyî welat, beşdarî avakirina rêxistineke çandî ya kurdî li Swêdê bû.

Piştre di sala 2014’an de li Ewropayê di avakirina “Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK” de beşdar bû û piştre xebatên wê derbasî herêmên Rojavayê Kurdistanê bûn.


Di warê medyayê de jî Huseynî di gelek televizyonên Kurdî de kar kir û bernameyên curbecur pêşkêş kir:

• Bernameya “ Sîmerê Tavsorkê ” di kanala kurdî “Mediya TV”.
• Bernameya “Dengvedana Peyvê” di kenala Roj TV de, ku di salên bernameyê de, bi zêdetirî sêsed helbestvan, nivîskar, hunermend, şanonivîs, rojnamevan û medyakarên navçeyên curbicur ên Kurdistanê û ji welatên derveyî re hevpeyvîn çêkir.
• Bernameya “Lavijên Rojava” di kanala “Çira TV”de.
• Bernameya “Şeva Hicran” di kanala “Ronahî” de.

Huseynî herwiha wek mêvanê rêzgirtinê di gelek beşên bernameyên televîzyonê û malperên elektronîk de beşdar bû, û rolek girîng lîst di rêkxistinkirin û vejandina gelek şevbuhêrkên helbestî, edebî û çandî de, ji bilî beşdarbûna festîvalên rewşenbîrî û çandî li Ewropa û Rojava, ku ev yek hebûna wî ya çalak di qada çanda Kurdî de li ser asta herêmî û navdewletî ye nîşan dide.

Ehmed Husênî ne tenê helbestvanek e, lê ew hilgirê peyameke çandî û neteweyî ye û bûye semboleke çandî û neteweyî , bi rêya helbest û xebatên xwe yên çandî, rolek girîng lîst ji bo zindî kirina ruhê kurdewarî, ji bo saxlemkirina çanda kurdî li hemberî hewldanên tinekirin û jinavbirinê xebitî, û rola wî di avakirina hişmendiya çandî ya li Rojava û xurtkirina nasnameya neteweyî de girîng û berçav dê bimîne. Daxwazên min ji bo wî serkeftin û afirîneriyek zêdetir, û saxlemî û tenduristiyek domdar.

## Têbînî



### Çima naskirina zimanê Kurdî di destûra Sûriyê de girîng e?

**Kemal Necim**

Roja 21’ê Sibatê, Roja Zimanê Dayikê yê Cîhanî bû, bi vê boneyê dîse li Rojava mijara naskirina zimanê Kurdî weke zimanekî fermî di destûra Sûriyê kete rojeva Kurdan. Di gelek çalakî û meşên ku hatin lidarxistin de dîse ev daxwaz derket pêş.

Di nêzî 15 salên dawî de, li Rojavayê Kurdistanê di mijara fêrbûna bi zimanê Kurdî de guherîn û pêşketinên pir mezin pêk hatin. Zimanê Kurdî êdî ji wan bend û qedexeyên rejîma deshilatdar rizgar bû û kurdan karî di nava van salan de, sistemeke xwe ya bi hêz û tekûz a perwerdeya bi zimanê xwe ava bikin. Bi sed hezaran zarok û ciwan li dibistan, peymangeh û zanîngehan bi Kurdî dixwînin û bawernameyan werdigirin. Di mehên dawî de hin geşedanên girîng li Sûriyê û Rojava pêk hatin, êdî mijara naskirina kurdan û mafên wan ket rojeva hikumeta demkî û behsa entegrasyonê tê kirin. Di gel van geşdanan biryarnemeyeke serokatiya hikumetê derket ku tê de behsa mafê kurdan ê ziman tê kirin. Lê ev biryarname di nava kurdan de weke gaveke pir li paş hat dîtin. Ji xwe Kurd li vî welatî ev 15 sal in bi zimanê xwe dixwînin û perwerde bibin, êdî derfeta ku gavekê paş de bavêjin û ji nû de bêjin ka ev mafê wan heye yan na ne gengaz e. Kurd niha li şûna ew gotinên şêlo ên di biryarnemaya serokatiya hikumetê de, doza naskirina zimanê Kurdî bi fermî di destûra welêt de dikin.

Gelo çima naskirina zimanê Kurdî di destûrê de girîng e?

Naskirina zimanê dayikê di destûrê de ne tenê gaveke sembolîk e, lê bijarteyeke siyasî û çandî ye ku xweza, nasname û hevsengiya civakî ya dewletê nîşan dide. Di civakên pir-etnîkî û pirzimanî de, ev naskirin kevirê bingehîn ji bo avakirina peymanek civakî ya dadperwer û aram e.

Dema ku destûr zimanên komên pêkhateyên cûda nas dike, ew dibe peyamek ku hemû welatî di mijara nirx û mafan de wekhev in, bêyî cudahî. Ziman li vir dibe beşek ji rûmeta mirovan, û naskirina wê tê wateya naskirina nasnameyê bi xwe.

Ziman hilgirê çand û bîra giştî ya gelan e. Naskirina destûrî zimanan ji paşguhkirin an windabûnê diparêze û rewatiya qanûnî dide ziman ku di warên perwerdehiyê, medyayê û rêveberiya giştî de were bikaranîn, bi vî rengî dê ziman ji nivşekî ta nivşekî din de bimîne û berdewam bike.

Di gelek rewşan de li welatên pir-etnîkî rewşên aloz û arîşe û nakokî derdikevin, ji ber ku netewên li wî welatî hîs dikin ku ew paşguhkirî ne. ji ber Dema ku zimanek tê paşguhkirin, axaftvanên wî zimanî xwe ji hêla siyasî ve weke dûrxistî û paşguhkirî hîs dikin. Naskirina destûrî van hestan sivik dike û baweriyê di navbera dewlet û welatiyên wê de xurt dike, bi vî awayî aramî jî pêş dikeve.

Li aiyekî din, li gorî gelek lêkolînên zanistî, perwerdehiya bi zimanê dayikê di qonaxên destpêkê de têgihîştin û serkeftina akademîk zêde dike. Lewma naskirina destûrî rê dide pêşxistina polîtîkayên perwerdehiyê yên ku rêz li vê mafî digirin û derfetê dide zarokan ku bi zimanê xwe bêyî astengiyên psîkolojîk an jî nasnameyî fêr bibin. Dewletên ku dikarin bi serkeftî pirengiyê bi rêve bibin, ew dewlet bêhtir serkeftî ne, ji ber vê yekê naskirina pirzimanan dihêle ku pirrengî li şûna ku bibe egera arîşe û nakokiya, bibe çavkaniyek dewlemendkirina çandî û şaristanî.

Tişta herî girîng jî ku naskirina ziman di destûrê mafek destûrî ye ku rêzgirtina dewletê ji bo pirrengiya welat nîşan dide.

# Barana zêde piştî salên hişkesaliyê hêviya cotkaran vedgerîne

Şêniyên bajarê Çilaxa tekez kirin ku ji ber barana zêde piştî salên hişkesaliyê hêviyên wan di misogeriya demsaleke serkeftî de vegerand. Şêniyan banga pêwîstiya hişyarkirina karanîna ava bendava Çilaxa di pêşerojê de kirin, da ku bendav ji bo cotkaran wekî çavkaniyek avê bimîne.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Bajarokê Çilaxa û herêma Aliyan wekî her bajar û bajarokên Rojava şahidiyê ji baran û berfa zêde ya vê salê, ku hêviyên cotkaran piştî salên dirêj ên hişkesaliyê vegerand. Barana îsal bandoreke mezin li ser sektora çandiniyê kir, hişt ku qadên çandiniyê zêde bibe herwiha vegera cotkaran ji bo îstîsmarkirina zeviyên çandiniyê ku ji ber salên dirêj ên hişkesaliyê nehatibûn çandin. Di heman demê de barana vê dawiyê bû alîkar di başkirina berhemên çandiniyê û bilindbûna derfetên gihaştina hilberîneke baş.

**Bendava Çilaxa dîsa av lê diherike**

Piştî salên dirêj ji hişkesalî, zûwabûn û kêmbûna avê, îsal ji ber başbûna rêjeya barîna baranê û bilindbûna asta avê di hefteyên borî de, careke din av vegeriya bendava Çilaxa mîna berê. Ji ber kêmbûna baranê di zivistana sala 2025`an û salên borî de di heman demê de qutbûna ava kaniyên nêzî bendavê, asta ava bendava Çilaxa daketibû 350 metrekaban ku rêjeya wê ya asayî 500 metrekab e.
Kêmbûna asta avê sala borî di bendava Çilaxa de hişt ku bi awayekî neynî bandorê li ser sektora çandiniyê û sewaldariyê li gundewarên derdora wê bike. Herwiha fikarên şêniyan ji



Ebdulrehman Elî

demsaleke dijwar û kêmbûna çavkaniya zêde kir, lê îsal rewş guherî û av vegeriya da ku qadên ku zûwa bibûn dîsa av lê biherike.

**‘Hêviya demsaleke baştir li me vegeriya’**

Di derbarê vê mijarê de cotkarekî ku navê wî Ebdulrehman Elî ye ji me re wiha anî ziman: “Bilindbûna asta ava bendavê hêviya demsaleke baştir li me vegerand, bi taybet çandina genim û ceh. Ava bendavê li gorî rêjeya wê ya asayî hîn jî kêm e, lê dîsa em herikîna avê wekî mizgîniyekê dibînin û hêvî dikin ku mîna berê vergere.” Ebdulrehman Elî tekez kir ku bendav wekî damareke girîng ji bo avdan û piştgîriya ewlehiya xurekê ya herêmî ye û wiha got: “Dema ku av vedigere jiyan jî pê re vedigere, erd ji nû ve nefes digre û cotkar bi baweriyek mezintir vedigerin zeviyên xwe.” Ebdulreheman Elî destnîşan kir ku li ser girîngiya birêvebirina çavkaniyên



Mihemed Şiwêş

avê bi awayekî domdar, ji bo parastina rezervên stratejîk û dûrketina ji bandorên her demsalên hişkesaliyê yên pêşerojê û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Kêmbûna baranê û karanîna nehevseng a ava bendavê ji hêla me wekî cotkaran ve bû sedema ziwabûna bendavê, divê ji îro û pê ve bi baldarî em xwe bispêrin ava bendavê.”

**‘Vergera avê vejîna sektora aborî û civakî ye’**

Ji aliyê xwe ve ciwanekî bi navê Mihemed Şiwêş ku xwediyê zeviyekî çanidniyê ye li nêzî bendava Çilaxa wiha got: “Vegera avê bo bendavê ne tenê bûyereke jîngehî ye, lê nîşanek ji bo vejîna beşek ji sektora aborî û civakî ya herêmê ye, ji ber ku av rasterast bi çandinî, kar û aramiyê ve girêdayî ye.
Vegera avê di bendava Çilaxa de hêviya demsaleke çandiniyê ya serkeftî da me, piştî salên dirêj ji hişkesaliyê û ziwabûna bi temamî



ya bendavê di seranserî salekê de, lê îsal dîsa hêvî li cotkaran vegeriya ji bo misogeriya demsaleke serkeftî. Di heman demê de vegera jiyanê ji aliyê estetîka bendavê û derdora wê, ji ber ku bendav ji bo gelê herêmê wekî cihekê bêhnvedaneke xwezayî ye.”

**Avabûna bendava Çilaxa**

Di sala 1974’an de bendava Çilaxa bi dirêjahiya 700 metre û firehiya 37 metreyan hate çêkirin, gola bendavê têra 10 milyon metrekab avê dike, çavkaniya golê ava baranê û kaniyên gundên derdorê ye.
Bendava Çilaxa li aliyê bakurê bajarê Cilaxa di salên 70’ê de hat avakirin, ji bo avdana qadên çandiniyê ku li ser kenalên avdanê yên girêdayî bendavê dirêj dibe. Bendava Çilaxa çavkaniyek sereke ye ji bo dabînkirina pêdiviyên deverên derdorê bi avê. Wekî din ew cihek girîng û jîngeheke bi masiyan dewlemend bû. Bendav bi giranî xwe dispêre ava kaniyên gundên cîran ên Aliyan wekî kaniyên gundên Lodka, Qastepan û Bakirwan in. Ji bilî ku ew çavkaniyeke avê ye ji bo erdên derdora wê, ku bi hezarên hektaran tê texmînkirin. Wekî din bi hezaran darên çamê û yên din li derora wê hatibûn çandin, lê ji ber qutkirina bê ser û ber bandoreke mezin li ser welatiyan û derdorê kir.

# Qedexekirina derbasbûna kamyonên biyanî ji bo xaka Sûriyê

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Di biryarekê de ku naveresta bazirganiyê li dewletên cîran matmayî hişt, hikumeta demikî ya Şamê di destpêka meha Sibatê de qedexeya li ser kamyonên biyanî bo xaka Sûriyê ferz kir, ji bilî kamyonên transêtê.**

Biryara qedexekirina derbasbûna kamyonên biyanî bo xaka Sûriyê di tevgera veguhestin û kelûpelan de li deriyên sînor ên bi Urdun, Lubnan, Tirkiyê û Iraqê re tevliheviyek berfireh çêkir. Di heman demê de nîqaşeke germ di navbera kesên ku vê biryarê wekî biryareke serwer dîtin ku filoya veghustinê ya herêmî vejîn dike û kesên ku hişyarî dan li ser bandorên wê li ser bazarên Sûriyê, derxist holê.

**Qerebalixiyeke bêhempa li deriyên sînor**

Ji dema derketina biryarê, dergehên Nuseyb-Cabir bi Urdinê û Cedîdî Yabûs- El-Mesni bi Lunanê re veghurîn



qadeke tijî kamyonên ku bi rojan li bendî dimînin ku bê vekirin, li şûna ku kamyonên Urdin, Lubnan û Kendavê ber bi hundirê Sûriyê ve wekî her car derbasî Sûriyê bibin, ev kamyon niha neçar in ku barên xwe li nav depoyên gumrikê yên sînor de daxin, piştre ev kelûpel bi rêya kamyonên Sûrî têne veguheztin ber bi bazarên herêmî, ev mekanîzme jê re tê gotin“Back to Back”.
Ev tedbîr hişt ku lêçûna derbasbûnê bilid bike, rojnameya The National di rapora xwe de ev yek piştrast kiriye ku lêçûna veguheztina kelûpelan bi rêjeya di navbera ji sedî 50 û 70 bilind bûye, bi taybet kelûpelên ji Tirkiyê û Lubnanê tên, bi taybet kamyonên ku ji Urdinê tê bihayê wê dighêje 1000 dolarî.
Rojnameyê zêde kir ku derengiya ku di proseya daxistin û barkirinê ji hefteyekê heya du hefteyan dirêj dike, ev yek bûye sedema fikarên mezin li ser çarenûsa kelûpelan bi hemû cûreyan, nemaze xwarin û dermanan ku hewceyê kamyonên cemidî ne.

**Metirsiyên zêde**

Di vê çarçoveyê de, şandeyeke ji Urdinê ku vê dawiyê serdana Şamê kiribû hişyarî da ku piraniya kamyonên veguheztinê yên Sûriyê kevin in, temenê wan di navbera 30 – 40 salî de ne, ev yek dibe sedema metirsya winadabûna kelûpelan herwiha xirabûna wan di dema veguheztinê de, ji ber ku gelek şoferên Sûrî bi awayekî serbixwe dixebitin û di hilgirtina barên hesas de tecrûbeya wan tune ye.

**Sedemên fermî yên biryarê**

Ji aliyê xwe ve, Rêveberê Têkiliyên Giştî di Desteya Giştî ya Dergeh û Gumrikê de ya Sûriyê Mazin Alûş diyar kir ku armanca vê biryarê “filoya veguhastinê ya Sûriyê ji nû ve aktîv bike”, ku ji ber şer û cezayan bi salan hatibû rawestandin herwiha tekez kir ku şoferên kamyonan li welatên cîran rasterast nehatine hedefgirtin.
Derbarê kamyonên transêtê de, serokê Komeleya Gumrik û Kampaniyên Veguhestina Kelûpelan a Urdinê, Deyfellah Ebû Aqûla, piştrast kir ku tenê îstîsna di biryarê de ji bo kamyonên ku di transît de derbas dibin, bi şertê ku ew ji hêla rayedarê gumrikê yê Sûriyê ve di navbera her du deriyên sînor de werin pêşwazîkirin, ji bo misogerkirina ku kelûpel di xaka Sûriyê de neyên daxistin.
Di demekê de ku danûstandin di navbera Sûriyê, Urdin û Lubnanê de ji bo gihaştina çareseriyên pratîkî berdewam dikin, deng bilind dibin ku hişyariyê didin li dijî berdewamiya pêkanîna vê biryarê, ji ber ku dê bandorek neyînî li ser xerîdarê Sûrî bike di heman demê de ji ber ku bihayên kelûpelan dê ji ber zêdebûna lêçûnên veguhastin, dabînkirin û hilanînê, ji bilî îhtîmala gihaştina zirarê li ser kelûpelan û windabûna wê di nava bazaran de, bilind bibin.



# Peymana 29’ê Çileyê; Di nava pêkanîn û gotûbêjê de

Xebatên ji bo pêkanîna peymana di navbera QSD û hikumeta demkî ya Sûriyê de didomin. Di vê çarçoveyê de têkildarî mijarên îdarî, leşkerî û ewlehiyê civîn û hevdîtin çêdibin, hêzên ewlekariyê li xalên hatine destnîşankirin, bicih bûne. Parêzgehê Hesekê dest bi kara kiriye, lê hê jî hin bendên peymanê pêk nehatine û gotûbêj li ser wan dewam dikin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Berxwedana gelê Kurd şer veguherand ser maseya diyalogê**

Şerê ku li Sûriyê rû da ne tenê di navbera QSD’ê û HTŞ’ê û de dibû. Di nava vî şerî de hejmareke zêde dewlet hebûn. Ev şer di navbera dîktatoriyê û azadiyê de bû. Hêzên desthilatdar û hegemon xwestin ku şer bikin şerê navxweyî yê Sûriyê, lê wisa nebû. Ji ber nûnerên Rojava her dem dixwestin ku li dora maseyekê bêne gel hev û bi diyalogê li şûna şer, mijaran çareser bikin. Ev yek bi encam bûi, bi berxwedana gelê Kurd maseya muzakereyê hat danîn û rêveberên Kurdan li ser maseyê cihên xwe girtin.

**Agirbest heye, lê metirsî jî dewam in**

Dibe ku êrişên ji 6’ê Çileyê ve yên ji aliyê çeteyên HTŞ’ê, DAIŞ’ê û çeteyên giredayî Tirkiyê ve hatibû destpêkirin, hatibin rawestandin. Lê hê jî metirsiya gefxwarinê li Rojavayê Kurdistanê heye. Piştî êriş û dorpêça li ser herêmê, berxwedana gelê Kurd û dostên Kurdan encam da. Hikumeta demkî ya Şamê neçar ma ku bi navbenkariya Amerîka û Fransayê bi hêza QSD’ê re peymaneke nû îmze bike û li gorî vê peymanê agirbesteke hate ragihandin. Li gorî peymanê taybetmendiya bajarên Kurdan bên parastin û li herêmên Kurdan hêzên asayîşê yên ewlehiya hatine erkdarkirin. Ev lihevkirin ji aliyê gelek dewletan ve hat pêşwazîkirin û ew wekî gaveke girîng ber bi kêmkirina rageşiyê hate binav kirin. Herwiha peymana 29’ê Çileyê wekî rojevek sereke ya herêmê û cîhanê cihê xwe diparêz e.

**Lihevkirina 29’ê Çileyê wiha bû:**

Li ser bingeha peymanek berfireh, di navbera hikumeta Sûriyê û QSD de peymanek agirbestê hate îmzekirin, her wiha derbarê entegrasyonek qonax bi qonax a hêzên leşkerî û îdarî ji her du aliyan lihevhatin hate kirin. Li gorî lihevkirinê ku 29’ê Çileyê hat ragihandin ewbû ku agirbest pêk were. Hêzên leşkerî ji xalên pêşîn vekişin. Hêzên ewlehiyê yên Wezareta Karên Hundirîn têkevin navendên bajarên Heseke û Qamişlo û entegrasyona hêzên ewlehiyê li herêmê werek destpêkirin. Dîsa 3 tugayên leşkerî yên QSD’ê werin avakirin û tugayek li Kobanê girêdayî Parêzgeha Helebê de,



were avakirin. Entegrasyona saziyên Rêveberiya Xweser di nav saziyên dewleta Sûriyê de were pêkanîn, karmendên sivîl werin tayînkirin. Mafên sivîl û perwerdehiyê yên gelê Kurd werîn pêkanîn. Vegera koçberan bo deverên wan were mîsogerkirin. Armanca peymanê yekkirina axa Sûriyê, pêkanîna entegrasyonê li herêmê, xurtkirina hevkariya di navbera aliyên peywendîdar de û yekkirina hewildanên ji bo ji nû ve avakirina welat e.

**Pêkanîna peymanê 2’yê Sibatê destpê kir**

- 1’Sibatê şandeyên hikumeta demkî derbasî Hesekê û Kobanê bûn, civîn hatin çêkirin.
- 2’yê Sibatê li Hesekê bi amadebûna fermandarê Hêzên Asayîşê Mihemed Xelîl Elî (Siyamend Efrîn), fermandarê hêzên ewlekariyê yên bajarê Hesekê Merewan El Elî yê ji aliyê hikumeta demkî ve hatiye tayînkirin û fermandarên Hêzên Ewlekariya Hundirîn civîn hat çêkirin. Di hevdîtinên ku ji ragihandinê re girtî hatin lidarxistin de, gavên pêşîn ên pêkanîna lihevkirinê hatin nîqaşkirin.
- 2’yê Sibatê şandeya hêzên hikumeta Şamê derbasî sînorên gundewarên bajarê Kobanê bûn û li xalên ku bi hemahengiya Hêzên Asayîşê re hatibûn diyarkirin, belav bûn. Di heman rojê de hejmarek sînordar a hêzên Wezareta Hundirîn a Hikûmeta Demkî ya Sûriyê di bin çavdêriya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Kantona Cizîrê de derbasî bajarê Hesekê bûn.
- 3’yê Sibatê jî şandeya hikumeta demkî, bi tevkariya Asayîşê derbasî bajarê Qamişloyê bûn û li ser pêkanîna peymanê danûstendin kirin.
- 4 sibatê parêzgerê Hesekê Nûredîn Îsa Ehmed diyar bû, gel ji bo pêşwazîkirin kom bû.
- 5’ê Sibatê parêzgarê Hesekê ji aliyê girseya gel hat pêşwazîkirin. Di heman rojê de şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Kobanê ji hevserokê Meclisa Rêveberiya Xweser Ferhan Hec Îsa, hejmarek nûnerên rêxistinên û rêveberên bajarê Kobanê û rûspiyên pêk dihat çû Helebê. Şande li avahiya parêzgeriya Helebê bi fermandarê giştî yê hêzên ewlekariyê yê parêzgeha Helebê Mihemed Ebdulxenî û cîgirê wî Elî Henûra û hejmarek berpirsên din ên hêzên ewlekariyê yên hikumeta demekî re civiya. Di civînê de pirsgirêkên herêmê û mekanîzmeya kar li gorî bendên lihevkirinê nîqaş kirin. Di heman rojê de jî Rêveberiya Kobanê û ya parêzgeha Helebê li ser pirsgirêkên koçberan, qutbûna avê, internet û kehrebê civîn çêkirin.
- 6’ê Sibatê endamê fermandarên komên hikumeta demkî bi serokatiya Hemze El Himêdî li Hesekê bi endamên Fermandariya Giştî ya QSD’ê Çiya Kobanê û hejmarek din ên fermandarên QSD’ê re civiyan. Di civînê de qonaxên entegrasyona leşkerî û rêbazên pêkanîna wê hatin nîqaşkirin. Li gorî çavkaniyan, cihên ku dê wekî bargehên 3 tugeyên leşkerî yên QSD’ê werin tesbîtkirin, hatine gotûbêjkirin.
- 7’ê Sibatê Fermandarê hêzên ewlekariyê yê Hesekê yê ji aliyê hikumeta demkî ve hatiye tayînkirin Merwan El Elî, bi amadebûna rêveberên Hêzên Asayîşê Mehmûd Xelîl Elî serdana parêzgerê Hesekê Nûredîn Ehmed kir.
- 8’ê Sibatê şande ji hevseroka Hêzên Asayîşa Kobanê Arîn Kobanê û hejmarek endamên Hêzên Asayîşê pêk tê, li avahiya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Helebê, ji aliyê fermandarê Hêzên Ewlekariya Hundirîn ê Helebê Mihemed Ebdulxenî ve hat pêşwazîkirin.
Di hevdîtinê de mekanîzmayên pêkanîna bendên lihevkirina 29’ê Çileyê, rêbazên pêxistina ewlehiyê di navbera her du aliyan de hatin gotûbêjkirin. Di civînê de jî çawaniya tensîqkirinê ji bo rakirina dorpêça li ser bajarê Kobanê, mekanîzmayên hevkariyê di navbera hêzên ewlehiyê li Kobanê û gundewarê wî ku rewşa ewlehî baş bibe û tevgera şêniyan hêsan bibe hatin nîqaşkirin. Di heman rojê de şandeyeke hikumetê serdana Balafirgeha Navneteweyî ya Qamişlo kiribû.
- 9’ê Sibatê şandeyeke hikumeta demkî serdana Rêveberiya Zeviyên Petrolê ya Rimêlan kir.
Şande ji nûnerên Hêzên Ewlekariyê yê hikumeta demkî, Rêveberiya Ewlehiya Derî û Balafirgehan, Desteya Giştî ya Balafirgehan a Sivîl û nûnerên Şîrketa Sûriyê ya Petrolê pêk dihat.
- 9’ê Sibatê şandeyek Ewlekariya Giştî ya girêdayî Wezareta Navxweyî ya hikumeta demkî ya Sûriyê bi Hêzên Ewlekariya Hundirîn (Asayîş) civînek li bajarokê Çelebiyê yê rojhilatê bajarê Kobanê lidar xistin.
- 16’ê Sibatê Parêzgarê Hesekê komîteyek tibî ji bo entegrakirina beşa tenduristiyê erkdar kir.
- 17’ê Sibatê Wezîrê Rewşên Awarte û Karesatan a hikumeta demkî ya Sûriyê Raid El Salih serdana parêzgeha Hesekê kir, li wir ji aliyê Parêzgarê Hesekê Nûredîn Ehmed, bi amadebûna şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Kantona Cizîrê nûnerên Desteya Karûbarên Civakî û Kar, Tîma Agirkujiyê, rêxistinên rakirina mayînan û nûnerên koçberên Serêkaniyê û Efrîn pêk dihat, ve hate pêşwazîkirin.
Armanc ji serdanê rewşa xebata xizmetguzarî ya parêzgehê were şopandin, rêbazên hemahengiyê di navbera her du aliyan de werin nîqaşkirin ku bersivdana rewşên awarte werin xurtkirin û performansa saziyane û xizmetguzariyê werin başkirin. Di civînê de amadebûyan mekanîzmayên entegrasyona saziyan û pêşxistina asta xizmetguzariyan bi taybet jî warê birêvebirina karesatan û destwerdana lezgîn hatin nîqaşkirin. Li kêleka wê jî nirxandina amadebûna kadroyên pispor û pêşxistina sûdwergirtina ji pisporiyan hat kirin.
- 18’ê Sibatê xebatên entegrekirina saziyên tenduristiyê li Hesekê dest pê kir

- 20’ê Sibatê Parêzgarê Hesekê ragihandibû ku ji bo xurtkirina rewşa xizmetguzarî û îdarî gelek xebat têne kirin û dabû zanîn ku ji wan gavan dê hemû rêyên bajar werin vekirin û komeke girtî werin berdan. Li gorî malpera fermî ya parêzgehê, Parêzgarê Hesekê Nûredîn Ehmed xebatên xizmetguzarî û îdarî yên ku dê werin kirin aşkera kirin.
Parêzgarê Hesekê diyar kiribû ku piştî temamkirina xebatên pêwîst ên bi armanca silametiya tevgra trafîkê, dê ji roja yekşema bê ve tevahî rêyên bajarê Hesekê werin vekirin.
Parêzgar da zanîn ku roja şemiyê (20 Sibat) şandeyek teknîkî ji Şamê tê ji bo ku xebatên jinûve vekirina Balafirgeha Navneteweî ya Qamişloyê temam bike û dîsa bikeve xizmetê.
Nûredîn Ehmed destnîşan kiribû ku komîteyeke pispor çavdêriya pêvajoya entegrasyona saziya giştî ya bazirganî û hilberîna dexlûdan dike û karmendên berê hatine derxistin li gorî rêzikên qanûnî vegeriyane karê xwe.
Parêzgar diyar kir ku wê sibe (şemiyê), komeke girtiyan were berdan û dê rêwîtiyên bejayî yên navbera Hesekê û Şamê jî jinûve werin destpêkirin. Ev yek dê têkilî, tevgera welatiyan û kelûpelan hêsantir bike. Parêzgar Nûredîn Ehmed daxuyandibû ku ji bo jinûve aktîvkirina tevahî beşên xizmetguzariyê ku pêdiviyên şêniyan dabîn bikin, îstîqrara îdarî û xizmetguzarî xurttir bikin, dê qonaxa bê bi rêya saziyên parêzgehê bêtir gavên pratîkî bi xwe re bîne.

- 21’ê Sibatê şandeyeke teknîk a hikumeta demkî ya Sûriyê gihaşt Balafirgeha Navneteweyî ya Qamişlo, da ku ji bo jinûve xebitandina balafirgehê dan û standinan pêk bîne. Şande ji alîkarê serokê Desteya Balafiran a Sûriyê Emced Nexal û hejmarek teknîsyenan pêk hat û ji aliyê fermandarê Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Parêzgeha Hesekê Merwan Mehmûd û fermandarê Hêzên Ewlekariya Hundirîn Mehmûd Xelîl Elî ve hat pêşwazîkirin.

- 22’ê şandeke hevbeş ji asayîş û ewlehiya navxwe ya Hesekê serdana bajarê Efrînê kir, serdan ji bo hemahengiya vegera koçberên Efrînê bo malên wan e. Şand ji Merwan Elî fermandarê ewlehiya navxwe li Hesekê û fermandar di asayşê de Siyamend Efrîn pê dihat û li gel Mihemed Ebdulxenî fermandarê ewlehiya navxwe li Helebê civiyan.

**Bendewariya pêkanîna hemû bendan beyî astengkirinê**

Ev gavên tên avêtin, nîşan didin ku xwestek heye da ku ev lihevkirin li ser erdê were çesipandin. Ev pêngav dê bibin amadekarî bû gevên berferhtir li ser dosyayên entegrasyonê û rêvebirina saziyan. Li aliyê din dorpêça li ser Kobanê û dagirkeriya Tirk a li herêmên Kurdan ku li pêşiya vegera koçberan dibin asteng, didiome. Herwiha dosya girtiyan jî di nava nîqaşên sereke de ye. Li ser van mijaran jî gotûbêj didomin. Li ser ji nûve bicîhbûnê û avakirina tabûran xebat û danûstendin berdewam dikin û çav li rê ye ku di rojên pêş de pêkanîna vê xala peymanê bidawî bibe.

# ‘Washington hewl dide piştgiriyê bide aramî û ewlehiyê’

Nûnera MSD'ê li Washingtonê Sînem Mihemed da zanîn ku ew li ser avakirina îstîqrarê, kêmkirina rageşiyê û piştgiriya çareseriyeke siyasî li gorî çarçoveyên navneteweyî yên peywendîdar dixebitin.



**Zana Roj**

Di demên dawiyê de ku bi geşedanên li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê re, gelek xebatên dîplomasî li ser asta cîhanê hatin pêşxistin, yek ji wan welatan jî Dewletên Yekbûyî yên Emerîka bû. Nûnerê Meclisa Sûriye Demokratîk MSD’ê li Washingtonê Sînem Mihemed bersiva pirsên Rojnameya me dan.

**Geşedanên ku li Rojava û Sûriyê qewimîn ji Washingtonê çawe lê tê meyzandin, şîrovekirin û nirxandin?**

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêşketinên li Rojava û Sûriyeyê ji perspektîfa piştgiriya îstîqrarê, pêşîgirtina li derketina terorê û pêşxistina çareseriyeke siyasî ya berfireh li Sûriyeyê dinêre. Rewş li ser bingeha parastina ewlehiyê, parastina sivîlan û misogerkirina rêzgirtina ji bo mafên hemû pêkhateyan tê nirxandin. Ev yek gelê Kurd û hêzên HSD’ê jî di nav xwe de digire ku ew wan wekî hevalbend û şirîkekê girîng di şerê li dijî terorîzmê de dibînin û di vî warî de nirxa xwe îspat kirine. Washington hewl dide ku piştgiriyê bide îstîqrar, ewlehiyê û hemû pêkhateyan biparêze. Vê yekê jî di çarçoveya yekparebûna axa Sûriyeyê de dibîne.

**Di rewşa heyî de kar û xebata diplomasî di çi astê de bi rêve diçe û bandora wê li ser pêşeroja Rojava û Sûriyê?**

Hewldanên me yên dîplomatîk bi rêya gelek kanalan berdewam dikin, di nav de diyaloga rasterast bi navendên lêkolînê û enstîtuyên girîng ên li Washingtonê re, û her weha bi rêya semîner û ragihandinê bi balyozxaneyên welatên Erebî û Ewropî yên ku bi rewşa Sûriyeyê re eleqedar in, tên meşandin.
Ev xebat li ser hevdîtinên bi endamên Kongres û Senatoyê re tê meşandin ku bi vê yekê em balê dikşînin li ser tiştên ku li ser erdê çê dibin û hevdu agahdar dikin. Em bi endamên civaka Kurd li hemû dewletan re di têkiliyê de ne da ku rola xwe wekî lobiyeke Kurdî bilîzin û em bi wan re di nava tensîqeke berdewam de ne û her tiştê pêwîstiya wan pê heye ji wan re tê peyda kirin.
Em li ser avakirina îstîqrarê, kêmkirina rageşiyê û piştgiriya çareseriyek siyasî li gorî çarçoveyên navneteweyî yên peywendîdar disekinin. Ev rê dê bibe wesîleya ku hawîrdorek aramtir biafirîne. Herwiha rê li ber pêşerojek ewle ji bo tevahî Sûriyê, tevî yên li herêmên ku piraniya wan Kurd in, veke. Bi taybet balkişandina ser rewşa koçberan, bi taybetî yên ji Efrîn, ku gelek caran koçber bûne û pêwîstiya vegera wan bo gund û malên xwe yên ku hatine dagirkirin heye.
Di heman demê de ji ber tiştên li Helebê, li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê qewimîn, di demên dawî de xebatên dîplomatîk pir zêde bûne.

**Ji bona ku statûya Rojava were parastin û gelê Kurd di milê siyasî û leşkerî bi xwe heremên xwe bi rêve bibe, pêwîste di qada siyasî û diplomasî de çi kar û xebat were kirin?**

Ji bo bidestxistin û tekezkirina vê yekê pêwîstî bi xurtkirina diyaloga Sûrî-Sûrî û misogerkirina nûnertiya dadperwer û bibandor a Kurdan di her pêvajoyeke siyasî ya pêşerojê de heye. Di heman demê de mafên wan ên destûrî, çandî û îdarî û beşdariya wan a dadperwer di hikumetê de tê piştrastkirin. Herwiha berdewamkirina xebata dîplomasî bi hemû aliyan re pêwîst dike ku bi taybet tensîqa navnetewî divê bê kirin da ku misogeriya pratîkirina mijara entegrasyonê bê şopandin. Ji bo pêşîgirtina li ber her gefên ewlehiyê yên ku çêbibin û piştgirîkirina avahiyên sivîl ên herêmî bi awayekî ku piştgirîya xebata rast û serkeftî ya rêveberiyê di çarçoveya Sûriyeyeke yekgirtî de bike ku rêzê li pirrengî û mafên mirovan digire.

**Pêşbîniya we ji bona dema pêş û bangewaziya we ji bona gelê Kurd di vê dema dîrokî û giring de çiye?**

Hêvî bi wê ve girêdayî ne ku heta çi radeyê hewldanên siyasî û dîplomatîk di veguherandina pirsgirêkên heyî bo derfetek serkeftî ji bo çareseriyek domdar ji bo aştî û aramiyê li Sûriyeyê de bi ser dikevin. Herwiha girêdayî wê yekê ye ku em çiqas baş rewşa heyî û guhertinên li Sûriye û Rojhilata Navîn bi giştî fam dikin. Banga me ji bona gelê Kurd ew e ku yekîtiya navxweyî û bi giştî yekîtiya Kurdan biparêze. Me di dema krîzê de şahidiya vê yekê kir, dema ku min ji seranserê Amerîkayê û ji hemû beşên Kurdistanê, bêyî ku cudahiya siyasî hebe, di nava danûstandinê de bûn. Wan di têkiliyên danûstandinê bi endamên Kongreyê yên li eyaletên xwe re rolek lîstin. Ji ber vê yekê, di vê qonaxê de yekîtiya Kurdan pir girîng e.
Herwiha xurtkirina hevkariyê bi pêkhateyên din ên Sûriyeyê re, û bi rêbazên siyasî û dîplomatîk xebitîn da ku mafên rewa di destûrê de di nav dewletek demokratîk û piralî de werin garantîkirin. Qonaxa niha ji hemû aliyan ve bi aqil tevgerandin, xweragirî û redkirina gotinên nefretê hewce dike. Helbet pêşxistina diyalogê wekî baştirîn rê ji bo bidestxistina armancên gel ji bo ewlehî, rûmet û aramiyê, tê dîtin.

## Guhertinên mezin çêdibin!



**Dilyar Cizîrî**

Guhertinên bi lez li herêma Rojhilata Navîn û ji nû ve pêşketina tevgera DAIŞ’ê ne tesadif e, ev bi plan û di çarçoveya stratejiya dîzeyna herêmê ya sedsala nû de pêş dikeve. Hêzên hegemon çawa zêdeyî sedsal berê di vê herêmê de bi Saykis Pîkot re sîstema dewlet netew di herêmê de li ser civakan dan ferizkirin, niha jî dîroka sedsalê xwe dubare dike. Hêzên navdewletî beriya Saykis Pîkot “Sîver” jî di nav de çend peyaman xêz kirin. Di pêkanîna wan de serneketin, herî dawî bi sînorê Saykis Bîkot plana xwe bi cih kirin.
Niha jî li Rojhilata Navîn dîrok xwe dubare dike. Nakokiya hêzên hegemon bûye kirîz û kawisa di herêmê de kûrtir kiriye. Her aliyek dixwaze ji aliyê din zêdetir bi dest bixe. Gefa êrişa li ser Îranê û şerê li Sûriyê, aloziya Îraq, LÎbiya, Luban, Sûdan û her wekî din bi tu awayî ji hev nayê qutkirin. Tişta li Sûriyê dibe û ji nû ve mezinkirina DAIŞ’ê beşekî wê planê ye. Wiha jî diyar dibe, guhertina li Sûriyê were zindîkirin ihtîmale li tevahî herêmê derbasdar be.
Îcar tişta li Sûriyê tê jiyankirin naveroka wê ye. Tişta balkêş hikumeta demkî ya HTŞ’ê bêyî di wê ferqê de be, bi israre sîstema dewlet netew ya berê rêjîma Essed dewam bike, desthilata xwe bi dare zorê li ser civakê feriz bike. Hemû pêkhateyan di bin navê islama sinî de bihleîne. Yenî ew nikare wekî rêjîma berê be, nerîna wan di gelê Sûriyê de hîn tengtire.
Êriş û plana wan li dijî Rêveberiya Xweser ku bi serkêşiya dewleta Tirk û çeteyên wê pêk hat, isbata nerîna wan a tenge. Bi vekişîna QSD’ê ji Reqa û Dêrzor û deverên din dê bala serê vê hikûmetê zêde bibe. Derketina DAIŞ’ê û êrişên wan li dijî çekdarên “Artêşa Sûriyê” beşekî sereka ya plana dîzeyna em behsê dikin. Vekişîna Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ji Sûriyê jî ne tesadife û ihtîmala mezin bi êrişa li dijî Îranê re guhertinên mezin ên di herêmê de destpê bike. Daxuyaniyên Rayedarên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka yên beriya niha di vê derbarê de hebûn. Diyare ji bo vê dîzeyna nû şerên mezin di herêmê de bêne jiyankirin. Dibe navenda şer Îraq û Sûriyê be.
Rêber Abdulah Ocalan yê herî zêde rewşa herêmê lêkolîn kiriye, ji dewleta Tirk û herêmê re “Banga Aştî û Civaka Demokratîk” wekî xeta çareseriyê di herêmê de pêşkêş kir. Manîfestoya Aştî û Civaka Demokrtîka ne tenê ji bo Tirkiyê û Bakur xeta çareseriyê ye. Xeta çareseriya berfireh û giştî ye. Di vê rewşê de heger hêzên desthiladar sûd ji banga Rêber Abdulah Ocalan ne girtin. Dê agirê şerê em behsê dikin wan jî bi xwe re bişewitîne. Hêza hegemon û sîstema cîhanê dê plana xwe bide meşandin.
Derketina DAIŞ’ê li Sûriyê dê sînordar nemîne û dibe derbasî hin welatên din jî bibe. Ev di demên pêş de wê diyar bibe û ihtîmale lûtkeya tevliheviyê bi êrişa li dijî Îranê re destpê bike. Di vê rewşê de divê gelê kurd hîn zêdetir yekîtiya xwe mezin bike.

# Lîbrealîzm?

**Hemza Sêvo**

**Lîberalîzm îdiyolojiyeke ku doza azadiya takekesî û demokrasiyê di hundirê dewletê de dike. Ev bîrdoziya siyasî li ser asta cîhanê tê naskirin û hejmarek baş ji partiyên cîhanê li ser bingeh û pîvanên wê hatine damezranin, herwiha li gorî rêgezên wê dixebitin.**

**Lîberalîzm**

Lîberalîzm peyveke koka xwe latînî ye û tê wateya azadîxwazî. Ji koka “Liber” ya ku tê wateya azadîyê hatiye afirandin. Ev peyv di Fransî de wekî “Liberte” tê bikaranîn. Têgîna lîberalîzmê ji sedsala 16’an ve ji bo pênasekirina îdeolojiya navendî ya modernîteya kapîtalîst dest pê kir. Ew yek ji têgehên dirûşma şoreşa Fransî ya “Liberte, Egalite, Fraternite”, ango “Azadî, Wekhevî, Biratî” ye. Lîberaliyet felsefeyeke siyasî û civakî ye ku azadiya takekes û mafê mirov diparêze. Herwiha li dijî rêbaza dewletê disekine dema ku ew dewlet destwerdanê di jiyana mirov de dike, hem jî bangê bi çandina rêgezên demokrasî û wekheviyê dike. Li Israîl, Îraq, Sûriyê, Keneda, Sûdan û hwd… welatên cîhanê partiyên lîberal tên dîtin.

**Pîvan û rêgezên lîberalîzmê**

Azadiya takekesî ji nirxên bingehîn û cewherî yên lîberalîzmê tê hesibandin. Lîberalîzm dibîne ku her kes xwedî mafê biryardayînê heye di derbarê jiyana xwe de. Di heman demê de ferd azad e di bawerî, fikir û xebata xwe de, lê divê mafên kesên din bin pê neke. Li hêla din jî yek ji rêgezên wê wekheviya di navbera takekesan de ye. Lîberalîzm girîngiyê dide pêkanîna demokrasiyê ji bo hemû mirovan û divê rêzdarî ji bo hemû mirovan pêkwere bêyî avakirina zayendperestî, olperestî û nasnameya civakî. Li ser bingeha demokrasiyê jî êdî lîberalîzm doza avakirina sîstemeke demokras di hundirê dewletê de dike, di bin wî mercî de be ku gel û nûnerên xwe hilbijêre ev hilbijartin jî divê bi rengekî azad û zelal bin. Lîberalîzm balê dikişîne ser hewcedariya zagoneke dadperwer û serbixwe ku her kesî bêyî cudakarî bi rê ve bibe. Di heman demê de ew piştrast dike ku hem kes hem jî hikûmet di bin desthilatdariya qanûnî de ne û divê ev yek li ser hemû aliyan pêkan bibe. Lîberalîzm rêzê li pirengiya bîrdozî, olî û siyasî digire, hem jî azadiya raman û derbirînê diparêze û cihêrengiya çandî û olî wekî beşek ji avakirina civakên tendurist dibîne. Lîberalîzma aborî piştgiriyê dide pergala bazara azad, aboriya li ser pêşbazî û hilberînê rê li ber dewlemendî û pêşketina aborî vedike. Lê belê, lîberalîzma nûjen ji bo misogerkirina dadmendiya civakî û pêşîlêgirtina kedxwariyê banga rêxistinkirna hikûmetê ya aktîv dike.

**Cureyên Lîberalîzmê**

Lîberalîzma klasîk: Lîberalîzma klasîk li ser azadiya takekesî û aboriya azad disekine, destwerdana dewletê di karûbarên aborî de red dike. Koka wê vedigere xebatên ramyarên wekî John Locke û Adam Smith.
Lîberalîzma civakî: Ev cure di sedsala bîstan de pêş ket, hevsengiya di navbera azadiya takekesî û wekheviya civakî de diparêze û piştgiriyê dide roleke aktîvtir ji bo hikûmetê di peydakirina tenduristî, perwerde û ewlehiya civakî de.
Lîberalîzma nûjen: Lîberalîzma nûjen di dawiya sedsala 20’an de hat derxistin. Vê cureyê girîngî da pêkanîna azadkirina bazaran û xebata aborî ji destê hikûmetê û kêmkirina rola dewletê li ser aborî.

**Dîroka lîberalîzmê**

Lîberalîzm di Ewropa de di serdema ronakbîrî de sedsala 16’an dest pê kir û şaxên wê belav bûn. Herwiha birêveçûna qonaxên dîroka mirovahiyê, pêş ve çû, da ku îro bibe ye yek ji girîngtirîn îdeolojiyên siyasî yên ku li serê cîhanê belav bû.
Serdema ronahiyê: Lîberalîzm di serdema ronakbîriyê de derket holê, di encama bangên fîlozofên wekî John Locke û Jean-Jacques Rousseau yên ji bo mafên takekesî û hewcedariya desthilatdariya hikumeteke li ser vîna giştî derket pêş.
Şoreşa şîşesaziyê: Di sedsala 19’an de, lîberalîzm bi şoreşa pîşesaziyê re hevdem bû ku bû sedema piştgiriya fikra bazara serbest û sivikkirina sînorên li ser bazirganî û bazirganiyê. Sedsala 20’an: piştgirên lîberalîzma civakî zêde bûn ji ber newekheviya aborî, ev yek jî bi zêdebûna daxwaza beşdarbûna hikûmetê di peydakirina xizmetguzariya civakî de.

**Rexneyên li ser lîberalîzmê**

Her çiqas lîberalîzm azadî û wekheviyê diparêze jî, lê rastî gelek rexneyan hat yek ji rexneyan jî ji ber takekesperestiya zêde. Hin kes lîberalîzmê rexne dikin ji ber ku takekesperestiya zêde teşwîq dike, ev dibe sedema têkçûna têkiliyên civakî û têkiliyên mirovan bi hev re. Herwiha kêmbûna dadmendiya civakî di vî warî de lawaz tê dîtin. Rexnegirên lîberalîzma aborî dibînin ku ew newekheviya civakî teşwîq dike, ji ber ku kesên dewlemend li ser hesabê kesên xizan sûd werdigirin. Di hêleke din de lîberalîzma nû hişt globalîzma aborî serdest bibe bandorên neyînî li ser aboriya herêmî ava kir û bû alîkar di warê zêdebûna valahiya aborî di navbera welatên pêşketî û lawaz de.

**Rêber Apo çi dibêje li ser lîberalîzmê?**

Rêber Apo di parêznameyên xwe de lîberalîzmê bi van nirxandina pênase dike: “Ji aliyê bîrdozî ve naskirina lîberalîzmê gelekî girîng e. Tenê gotina takekesî û azadîxwazî ji bo pênaseyê têrê nake. Weke têgîn, di şoreşa Fransayê de bi têgînên wekhevî û biratiyê re derketiye pêş. Navdar Liberte, Egalite, Fraternite wek têgeheke navendî li milê xwe yê rastê muhafezekarî û li çepê xwe jî destpêkê demokratan û piştre jî sosyalîstan dît. Ew wê weke nerîneke nerm a pêşxistina sîstemê (yekdestdariya kapîtalîst) bi rêveçûnê, bêyî hewcedariya şoreşan.”



# Heyva Sor a Kurd selikên xwarinê li koçberan belav dike

Hevseroka Heyva Sor a Kurd Hediya Ebdulah anî ziman ku Heyva Sor a Kurd roja Pêncşemê 19'ê Sibatê selikên xwarinê yên ku ji hêla Weqfa Xêrxwaziyê ya Kerkûkê ve hatine peyda kirin li 1,100 malbatên koçber ên ku li malên li taxên Kornîş û Rojava yên Qamişloyê, herwiha li Stadyuma 12'ê Adarê dijîn, belav kir.

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

Ji ber hejmara mezin a mirovên koçber û zexta zêde ya li ser stargehan û tevî zehmetiyan, Heyva Sor a Kurd hewlên xwe yên alîkarî û bijîşkî didomîne da ku gihîştina hejmareke mezin a gengaz a mirovan misoger bike, êşa mirovan sivik bike, herwiha pêdiviyên bingehîn ên xwarin, derman û xizmetên ambulansê yên lezgîn bi awayekî berdewam û rêxistinkirî peyda bike.
Heyva Sor a Kurd roja Pêncşemê 19’ê Sibatê selikên xwarinê yên ku ji hêla Weqfa Xêrxwaziyê ya Kerkukê ve hatine peyda kirin li 1,100 malbatên koçber ên ku li malên li taxên Kornîş û Rojava yên Qamişloyê,herwiha li Stadyuma 12‘ê Adarê dijîn, belav kir. Girêdayî vê mijarê Hevseroka Heyva Sor a Kurd Hediya Ebdulah ji Rojnameya me re axivî.

**‘Heyva Sor A Kurd bi erkên xwe radibe’**

Hevseroka Heyva Sor a Kurd Hediya Ebdulah diyar kir ku wan dest bi belavkirina selikên xwarin bi hevkariya xêrxwaziya Kerkûkê li koçberan kirine û wiha got: “Ji destpêka rewşa koçberbûne ya ku bûye yekser Heyva Sor a Kurd bi erkên xwe rabû û tiştên pêwîst kir. Ev ne cara yekeme ku em di rewşeke wisa derbas dibin ji ber wê jî em weke Heyva Sor a Kurd ji bo rewşên wisa awarte herdem hazirin, ji aliyê pêdiviyên jiyanê weke xwarin û vexwarin û pêdiviyên zarokan. Di vê demê de hejmareke mezin ji koçberbûnê çêbû bêhtirî ku me texeyil diki, lê tevî wisa jî tîmên me yên tenduristî, klînîkên gerok, tîmên belavkirina şîr û hefadeyên zarokan û yên belavkirina xwarinê ketin nava tevgerê bi şev û roj de ranewistiyan. Niha jî weke em dibinin rewş baştire ji demên destpêkê ve, bêhtir koçber bi cih bûne û pêdiviyên wan hatine peyda kirin. Sîstemek hatiye danîn û belvkirin li gorî wê tê belav kirin bi rengekî rehet û wekhev. Heyva Sor A kurd bi destgeha xêrxwaziya Berzanî li hemû stargehên koçberan ên li Rojavayê Kurdistanê alîkariyan didin. Ev alîkarî du caran hate kirin cara yekem me li koçberên li stargehan diman alîkarî belav dikirin, lê di vê cara duyem de em li koçberên ku di malan de bi cih dibin belav dikin heta niha me li 1,100 malan belav kirye.”

**‘Alîkarî li koçberên Qamişlo û Hesekê têne belavkirin’**

Hediya Ebdulah eşkere kir ku belavkirina alîkariyan ên koçberên di nava taxan de li heft taxan Kornîş, Xerbî, Hilîliye, Qidûr Beg, Enteriye, Erbewiye de ye û wiha got: “Alîkarî ji aliyê Dezgeha Xêrxwaziyê ya Barzaniyê Nemir û xelkê Silêmanî, Hecî Awa, Sincar, Raniya, Çemçemal û Pencwên li başûrê Kurdistanê ve tê dayîn. Û 45 ton derman ji aliyê Weqfa Xêrxwaziyê ya Kerkûkê, Kanala 8 û Bloka Helost ve hatine bexşandin. 40 ton ji Nexweşxaneya El Şeab re hatine şandin û pênc ton jî ji klînîkên mobîl re hatine belavkirin. Sûdmendên vê alîkariyê koçberên ji Efrîn, Şehba û Helebê ne, ku di encama êrîşên li ser bajarê Reqa, Tebqa û taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên bajarê Helebê di demên dawî de ji cih û warên xwe bûn. Di heman demê de Îro, Heyva Sor a Kurd 500 selikên xwarinê ku ji hêla Navenda Kurd a Amerîkî ve hatine dabînkirin, li 500 malbatên koçber ên ji Efrîn û Serê Kaniyê yên li bajarê Qamişlo belav kirin. Ji bilî wî jî belavkirin bi hevrêziya Encûmena Karûbarên Gel a Efrîn û Şahba û komînên taxan pêk hat û li 200 malbatên ku li taxa Qidûrbeg û 300 malbatên ku li taxa Erbawiyê ya bajarê Qamişlo dijîn, hat belavkirin. Tîma Heyva Sor a Kurd alîkariyên mirovî yên ku Başûrê Kurdistanê di 21’sibatê de selikên xwarinê li malbatên koçber ên ji Serê Kaniyê û Efrîna ku li taxên Muşeyrfa, Dahiya, Miftî û Salihiyê yên bajarê Hesekê dijîn jî belav kir.”



Hevseroka Heyva Sor A Kurd Hediya Ebdulah axaftina xwe wiha qedand: “Ev çalakî beşek ji rêze înîsiyatîfên ku armanc dikin sivikkirina zehmetiyên ku malbatên koçber pê re rû bi rû dimînin û nîşandana hevgirtinê bi wan re di van demên dijwar de ye. Rêxistinkerên kampanyayê pabendbûna xwe ya ji bo berdewamiya xebata mirovî bi fedakarî û berpirsiyariya herî zêde piştrast kirin, bi vî rengî hevgirtina civakê xurt dikin û êşa kesên giran sivik dikin. Em weke Heyva Sor a Kurd bang li sazî û rêxistinên navneteweyî, mirovî û tenduristiyê dikin ku alîkariya lezgîn bidin kesên li Rojavayê Kurdistanê û koçberên taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê bandor bûne.”

# Vegera li Efrînê her zindî ye di dilê gel de

**Berçem Silêman/Dêrik**

**Di 20’ê Çileya 2018’an ewrekê reş û tarî bi ser xweza, jîngeh û jîndarên Efrînê de hat. Di dema ku şer ji 7 salan ve li Sûriyê bi hêrs û dijwar diqewimî û dirêj dikir, tenê Efrîn aram û azad mabû. Lê diyar bû ku cîhan ji bo vê yekê ne rihet bû, aramiya Efrînê ew dêşandin ji ber vê yekê hemû dewletan destê xwe kirin destê dewleta Tirk a dagirker de û fermana êrişa Efrîna aram dan.**

**Berxwedaniya gelê Efrînê**

Gel û şervanên azadiyê li Efrîn berxwedana serdemê dane meşandin û vî şerî bandorek kûr li ser gelê Kurd kir, ruhê berxwedana neteweyî di dilê wan de çandin, hişyarî û têkoşîna wan xurt kir û xetereyên ku ji hêla hêzên tarî ve dihat derxistin eşkere kir. Herwiha bandorek girîng li ser qada navneteweyî kir, ji ber ku hemû hêzên demokratîk ji berxwedana ku ji hêla gel û şervanên azadiyê ve li Efrîn ji bo mafên rewa yên gelên bindest hatî nîşandan îlham girtin. Vê yekê alîkarî kir ku van hêzên demokratîk rêya xwe bibînin û beşdarî têkoşîn û berxwedanê bibin, rêya berxwedana gelêrî ya şoreşgerî ya li Efrîn nîşan da bişopînin.
Şerê li Efrîn hatî kirin di dîroka Kurdistanê



de cihekî taybet girt û ruhê berxwedanê di dîroka hemû gelên ku li ber xwe didin û li azadiyê digerin de vejîn kir. Erê, gelek şer derketine û Kurdistan di seranserê dîrokê de ji gelek pevçûnan êş kişandiye. Lê belê, şerê ku li Efrîn derket di dîroka tevgerên Kurd de bêhempa ye û di dîroka Kurdistan û herêmê de tu hevwateyek wê tune ye, ji ber ku jinan di vê berxwedana mezin de roleke pêşeng lîstin. Jinan di hemû aliyên berxwedanê de xwe birêxistin kirin û bi ruh û biryardariyeke bêhempa tevlî eniyên şer bûn, xwe feda kirin da ku bigihîjin armanca xwestî ya rizgarî û parastina mirovahiyê. Gelek jin mînakên vê yekê ne, wek Barîn, Avîsta, Zîlan û Suzdar. Di destpêkê de dagirkeriya Tirk deverên girîng û leşkerî, xetên parastinê yên yekem û xetên dabînkirinê bombebaran kirin. Ev bombebaran heta roja dawî ya berxwedanê di qonaxa yekem a berxwedana serdemê de berdewam kir. Ev êriş ne tenê ji hêla dewleta Tirk û çeteyên wê ve hat kirin, lê di heman demê de bi piştgiriya NATO û Rûsyayê jî hate kirin. Bi vê alîkariyê û piştgiriyê, Tirkiyê karîbû qonaxa xwe ya dagirkirin û qirkirinê li Efrîn bide destpêkirin. Gelê Efrînê piştî berxwedaniya 58 rojan berê xwe ji Efrînê dan Şehba û neçar man li wir 7 salan di bin çadiran de bicih bibin, tevî hemû êş û azarên ku rastî wan dihatin jî lê hêviya vegerê di dilê wan de hebû. Lê mixabin di sala 2024’an de careke din çeteyên hov êrişên qirkirinê li ser gelê Efrînê pêk anîn û bi hezaran careke din koçber bûn. Bi dehan zarok û kal ji ber serma zêde jiyana xwe jidest dan û hemwelatiyan berê xwe dan cihên biewle yên Rêveberiya xweser, lê hîn ku êşa koçberiyê di dilê wan de bû, careke din ji Tebqa, Reqa û Hesekê koçber bûn û berê xwe dan Qamişlo, Dêrik, Tirbespiyê, Amûdê û Dirbêsiyê û gundewarên van bajaran û li dibistan û mizgeftan bicih bûn. Niha jî civîn û hevdîtin tên kirin da ku gel vegerin cih û warên xwe û ev koçberî bidawî bibe.
Di derbarê vegera li Efrînê koçbera bi navê Xalîda Reşo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Hêviya vegera Efrînê her di dilê me de ye’**

Xalîda Reşo da zanîn ku gelê Efrînê rastî gelek êşan hatiye û wiha got: “Destpêkê me li Şêxmeqsûd jiyan dikir û piştî alûziya Sûriyê dest pê kir û êrişên hikumeta Baas li ser me pêk hatin, me ji Şêxmeqsûd bar kir û berê xwe da Efrînê û li wir jiyana xwe komî ser hev kir û hewil da jiyana xwe bi rehetî jiyan bikin. Lê mixabin dagirkeriya Tirk û çeteyên wê di sala 2018’an de êrişên qirkirinê li ser gelê Efrînê pêk anîn û gel neçar ma dev ji mal û milkên xwe û axa ku têde mezin bûye berde. Me berê xwe da Şehba û li wir 7 salan di bin çadiran de me jiyan kir û rastî sermê û germê hatin, di heman demê de dorpêc jî li ser me de hebû, lê me liberxwe dida û hêviya vegerê di dilê me de hebû. Lê di rojekê bê hisab çeteyan berê xwe dan Şehba û dest bi qirkirinan kirin, gelê Efrînê careke din barê koçberiyê hilgirtin û her tişt li şûn xwe hiştin û berê xwe dan cihên ewle yên Rêveberiya Xweser, gel jî gelekî destek û alîkarî dan me û rewşa me di berçavan re derbas kirin.”
Koçbera bi navê Xalîda Reşo di dawiya axaftina xwe de got: “Niha jî gelek civîn lidardikevin ji bo vegera Efrînê, em bi vê biryarê gelek kêfxweşin ji ber ku ev 9 salên me ye ku me gundê xwe nedîtiye. Em dixwazin bi serbilndî vegerin Efrînê û bi riya Asayîşê herin, ji ber ku me rûmeta xwe parast û me dev ji malên xwe berdan, heya dawiyê em ê rûmeta xwe biparêzin.”

## Bîra Civakê

### Civaka welatparêz civaka herî azad e



**Ehmed Hesen**

Di rastiya civakê de mirov dikare gelek nasnameyên ku mirov pê îfadeya hebûna xwe dide bibîne, nexasim çand û ziman nasnameyekê didin nasîn, lê belê nasnameya herî binirx û bilind ku mirov bê wê nikare behsa hebûna xwe bike, ew jî nasnameya welat e, em li vir behsa kertekî nakin, em behsa wateya nasnameya rastîn a ku nûnertîya hebûna mirov dike dikin. Welatê civakekê dergûşa parastina nirxên wê civakê ye, di heman demê de bîra parastina bîranînên civakekê ye. Gava ku mirovek bi êşekê hîs dike banga “ax” ji zimanê wî/ê derdikeve, ev yek girêdanbûna mirov a hundirîn bi axa ku li ser jidayîk bûye û jiyaye nîşan dide. Di destpêka şoreşa 19’ê Tîrmehê de ji ber ku gel bi salan e nikarîbû azad di welatê xwe de jiyan bike, bi zimanê xwe azad binivîse, bixwîne û bijî, li dijî sîstema Baasê serî hildan, weke berdewamîya serhildanên sala 2004’an xwestin ku zîhniyeta ku tenê rengekî qebûl dike biguherin û civakeke xwedî çand û ziman pêş bixînin, ji ber ku sîstema Baasê ew bê nasname hiştibûn, di welatê xwe de bê maf hatibûn hiştin, qirkirina çandî li ser dihat sepandin û hewlên asîmlekirinê li ser wan pêk dihat, wê demê gelê kurd di ferqeka pilanên mezin yên sîstema Baasê de bû, lewma jî hêdî hêdî dikarîbûn desthilata sîstemê ji ser herêmên xwe rakin û bikevin nava seferberiya parastina herêm û destkeftiyên xwe de. Wê demê ew kêlî ji bo hinek bav û dayîkên temenmezin xeyaleke mezin bû ku di rojeke wiha de bikaribin bi ziman û azadiya xwe jiyan bikin. Ji bo civakekê welatparaz bedelên giran dayîn hewce dike, li cihê ku hezkirin û girêdana bi axê ve hebe, li wir keddayîn, têkoşîn û berxwedan tê dîtin, lewma jî gelê kurd ji ber girêdana bi ax û welatê xwe ve li dijî hemû cûre êrîşan li ber xwe da, berxwedana Bendava Tişrînê nimûneya herî berbiçav a vê rihê welatparêz bû, dayîk û bavan, ciwan û jinên ciwan bi rihê şerê gel ê şoreşgerî seferber bûn û ji bo parastina av û rûmeta xwe berê xwe dan Bendava Tişrîn, tevî ku baş dizanîbûn ku wê werin hedefgirtin jî, lê rihê hevgirtin û girêdana bi rûmetê ji vê yekê mezintir bû. Civaka ku welatê xwe di dilê xwe de neke evîneke hebûnî û ji bo wê tênekoşe, wê di dawiyê de bê dil û bê welat jiyan bike. Gelê kurd jî bi vê rihê xwe û xistina welat di dilê xwe de weke evîneke ku têk naçe dikarîbûn bibin sînorên herî bilind li dijî hewlên dagirkerî û qirkirinê.
Ev rih ne tenê li Rojava, mirov dikare di destanên Kurdî yên weke Derwêş û Edûlê de jî bibîne, çaxa ku Derwêş ji bo parastina axa Şengalê bi 12 siwaran li hemberî bi hezaran leşker li ber xwe dide, ev rih di roja îro de di berxwedana Şêxmeqsûd de di kesayeta şehîd Ziyad Heleb û hevrêyên wî de hat jîyankirin, di 6 rojên şer de van qehremanan dikarîbûn cîhanê rakin ser piyan û hevgirtina gelê kurd nîşan bidin.
Civaka kurd di dîrokê de hertim bi welatparêzî û fedekarîya xwe ya li dijî qirkirinê li ber xwe daye û serî hilda ye, di heman demê de dîroka kurd bi qehremanên ku di berdêla hezkirina axa xwe de can kirine qurban dagirtî ye.